



Danerê rojnameya pêşî ya Kurdi  
Miqdad Mithed Bedirxan

# Armanç

Hejmar, No: 5

Çiriya Paşîn -November 1995

Buha-Price: 40 000 TL 20 SKR

4 DM



**KM'ya YEKBÛN'ê**

**”% 20’ê civakê ji  
mafê hilbijartinê  
bêpar e”**

“Hukûmet û Parlamentoya Tirkîye-yê bi armanca ku krîza siyasi, aborî û leşkerî di lehê rejîma şer de çareser bîke, bi lez û bez biryara ku hilbijartînen giştî di 24’ê Çileya Pêşîn de bête çêkirin, da. Bi vê biryara ku nêzî ji %20’ê civakê ji mafê hilbijartinê fîlî bêpar dihêle, çareserkirina pîrsen ku hene, ne mumkun e. Xwedî û tatbiq-karêni siyaseta ku HEP û DEP girtin, ji bo girtina HADEP, DDP û KDP ya ku hîn di pêvajoya damezrandinê de ye, dixebitin, parlamenteñerên ku hatine hilbijartin ji Parlamentoñê diavêjin û ceza dikan, ji xwe, dê dev ji wan he-wildanê xwe yên ku nahêlin irada demokratik a gel derkeve ortê, berne-din. Ev biryar, manewraya ku nefeskê dide siyaseta şerê qirêj e.

Tev vê ji divê pêvajoya hilbijartînen giştî bi her aliye xwe ve bibe pêvajoya ku hêzên aşîti û demokrasiyê, di warê pîrsa herî bingehîn a Komara Tirkîye-yê de, ji bo çareserkirineke aşîti û demokratik a pîrsa Kurd û Kurdistanê dengê xwe bilind dikan. Rêya vê, yekîtiya hêzên neteweyî yên bakurê Kurdistanê ye. Yekîtiya hêzên pêşverû, demokrat, sosyalist û aşîtixwazîn Tirkîye-yê ye. Yekîtiya hemû hêzên aşîti û demokrasiyê ye. Hêzên neteweyî yên bakurê Kurdistanê ne xwediyê luksa dubarekirina çewtîti-yen ku di dîrokê de hatine jîyin e.

Komîteya Navendî ya Partiya me, ji ber vê rastiyê, bangî hemû kes û mu-esseseyêne pêşverû, demokrat û aşîtixwaz dike ku divê ew beriya hertişî ji bo maf û azadiyê xwe, ji bo civake-ke demokratik û jiyanek azad, li daxwaz û mafêneteweyî yên meşrû yên gelê Kurd hîn bêtir bi xwedî der-kevin. Komîteya me ya Navendî ji bo pêvajoya hilbijartînen giştî di lehê hêzên welatparêz de bête guherandin, bangî hemû welatparêzen bakurê Kurdistanê dike ku divê ew ji bo amadekirina yekîtiya herî fireh û bi helwesteke muşterek hereketkirinê, fede-karî û hewildanan texsîr nekin. □

## Ma însan mexlûqatekî siyasî ye?

Her di wan rojan de, meseleyek wekî vê, li Tirkîye jî rû dabû. Li Îstenbolê piştî hilbijartînen rîexistina CHPê ya Îstenbolê heyetek nuh hatibû ser idarê. Serokê CHPê Deniz Baykalî, bal dikisand ser wê yekê ku yên hatine ser hukum sunnî - yanî ne Alewî- ne û Tirkîn. Ev, gaveka balkêş bû ji bo wî. Li ser vê gotinê, gellek rexne li Deniz Baykalî hatin kirin, ew bi şovenîzm û cudaxwaziyê hat tawanbarkirin. Baykal mecbûr ma, gavê baş de bavêje. Lê wê gava ku wî paşde avêt, bû wekî mesela uzira

ji qebahetê mezintir. Wî iddîa dikir ku bi wê balkêşanê xwestiye bibêje ku CHP idî partiyek welê ye ku ji bo endamên wê Kurdîtî, Tirkîtî, Alewîtî an Sunnîtî ne girîng in, ya girîng ew e ku hemî sosyal demokrat in. Di hilbijartînan de krîter, fîkr û xebat in, ne ku Alewîtî, Sunnîtî, Kurdîtî yan Turkîtî ye. Wî iftîxar dikir ku ew berî her tiştî CHPyî ne, sosyaldemokrat in. Deniz Baykalî bi axaftinê xwe dixwest CHPyîtîye û sosyaldemokrasiyê bike perdeyek welê ku hemû xusûsiyeten et-

nîkî û kulturî yên endamên wî veşere, bincil bike.

Ez fikirîm ku çawa dibû du kesen ji hev gellek cuda, yekî zâlim û yeka baziyyi ji ber zulmê wekî hev difikirin.

Gelo ji bo siyasiyan çîma diviya bû ku berî her tiştî meriv siyasi bûya? Çîma diviya bû ku meriv Alewîtî, Kurdîtî, Sunnîtî an biyanîtiya xwe dîrîxîsta pêş? Gelo sosyaldemokratî û Kurdîtî, Alewîtî an biyanîtiya meriv dijî hev bûn rê li ber hev digirtin?

rûpel: 3



Foto: Şîm Şîkakî

Bîstek û meşa Bonnê

## Kurdîn Sûriyeyê li Bonnê meşîyan

Bonn Ev cara pêşîn e ku Partiyên Kurdistana Sûriyeyê li derveyî welêt li hember balyozxaneya Sûriyeyê meş û mitîng çedîkin û bala raya Ewrûpiyan dikşinîn li ser neheqîya dewleta şovenî ya Sûriye-

yê ku ew mafê gelê Kurd gesb kiriye û 150 hezar hevwelatiyê Kurd bê nifûs hiştîye.

Meş ji aliye 4 partiyên Kurdistana Sûriyeyê; Partiya Demokrat a Kurd a yekî-

tiyê li Sûriyeyê (YEKÎTÎ), Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyeyê, Partiya Sosyalist a Kurd li Sûriyeyê û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê hat amedekirin.

rûpel: 7

## Li Swêdê hewildana vekirina Enstituya Kurdi

Strokholt 11 welatperwer û karbidestenê Kurd hewil didin ku li Swêdê Enstituyeke Kurdî damezirînin. Ji bo vê yekê jî 250 hezar Kron di nav xwe de berhevkiyê. Lê li gor agahdariyan kesen însiyatîfîgir dixwazîn çarçeweyê fireh bigrin û kesen din jî besdarî vê he-

wildanê bikin. Ji bo vê jî di 17’ye Çiriya Paşîn de civîneke fireh hat çêkirin û gelek kes besdarî vê civînê bûn. Kesen ku besdarî civînê bûn gîhaştin wê bawerîyê ku ev hewldan di ciyê xwe de ye. Di rojêne pêş de, dê kesen însiyatîfîgir biryara xwe ya dawî bidin. Li gor des-

tûra muweqet ku hatîye nîvîsandin dê navê vê organîzasyona ku bê avakirin Enstitû be, lê sutatuya wê dê wek weqfê be.

Wek tê zanîn cara pêşîn Enstituya Kurdi di sala 1983’an de li Parîsê vebû.

## Arî û antrepoloziya nefretê

rûpel: 8-9

# Nameyêñ Xwendevanan



## Ji rojnameya Armancê re

Hezar silav li we û li her yekî ku alîkariya xwe pêşkêşî we dike. Hêvîdar im hûn û Armanc hertim pêş ve herin û hûn armancê xwe bi serfirazî pêk bînin.


Ezê pir kêfxwêş bibim ku vê helbesta xwe "Sirûdêa Sermedî" di rûpelên Armancê de bibînim.

Xwîşka we Diya peyman

## Sirûda Sermedî

Roja nû bîşkivî  
Li şefqa sor û zer  
hinek ronahî dida  
kavil û gundêñ barkirî  
û tîrjein dî  
man dîl û girtî  
li zîndana felekê  
û destgirtîka bi nîşan  
yara dilê Laleş û Ararat  
sosina sîngâ Qamişlo û  
Mahabad

bi çavê xwe dît  
çawa zingar girt dora xelekê  
Lê her bi nêrîneke hêvîdar  
dinerî por xelekê  
û ev seriyêñ jar  
di nav dinanê birekê  
her û her  
sirûda sermedî  
berdewam dikirin



Mustafa Tanguner 1959-1985

## Di 10 saliya şehîdbûna Mustafa Tanguner de

Em wî bi hezkirineke mezin bi bîr tînin

Her roj dimirim  
Her şev min di goristana xewna te de vedîşartın  
Weke kulîlka hinarê  
Di vê bihara bê hinar de  
Ez li ser şaxen bêrikirina te dibîşkivîm.

Halim Can, Mûrad Ciwan, M. Ali Yıldırım, Mumtaz Aydin, Nafi Cilgin, Vildan Tanrikulu, Mustafa Aydogan, Mamoste, Mahmûd Lewendî, Şefik Oncu, Zekeriya Çelik

## Celadet Ali Bedirxan

## GÜNLÜK NOTLAR

(1922-1925)

Dilini sadeleştirerek yayına hazırlayan  
Malmîsanij

Stockholm 1995

## Ji Redaksiyona Armancê re

Heta nuha 3 hejmarêñ Armancê yêñ ku li Tirkîyeyê derçûne ketîne destê min, bi rastî ez pê gelek kêfxwêş bûm ku Armancê piştî 16 salan gavêñ xwe ber bi riya welêt avêtin. Hevî dikim ev gav her berdewam bin û Armanc hîn dewlemdendir û xwestir be. Di hêrsê hejmaran de jî hin xe-

letî û kêmasyîñ teknîkî hebûn. Hevîdar im ku ev xeletî û kêmâsî di demekê kurt de ji holê rabin.

Bi daxwaza serkeftina we.  
Birayê we  
Sîrwan Xalid

## Ji xebatkarêñ Armancê re

Em Kurdêñ Konyayê ne, gelek kêfa me ji Armancê re tê. Sipas ji Kurdperweriya wê ya mezin re.

Ez dixwazim bahsa Kurdêñ Anadolîyê bikim. Em Kurdêñ Konyayê ne, bav û kalê me ji ber zulma Osmanî û Kemalîstan di navbera salêñ 1850 -1940 de barkirine hatine derdora Anqerê û Konyayê bi cî bûne.

Ü li van deran nêzikî 200 gundêñ Kurdan hene. Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, Sekreterê DDP Fehmî Demîr, Abûqatê HADEP'ê Yusûf Alataş û Kemalîstê Tirk Toktamış Ateş ke-

sên naskirî yêñ herêma me ne. Em dixwazin Armanc biçe Anadolîyê û bi Kurdêñ Konyayê re hevpeyvînan çêke û nûçeya li ser wan binivîsîne. İhtiyaciya me gelek heye; ji ber ku em rewşa wan baş nizanin.

Ji Kurdêñ Anadolîyê nêzikî 8.000 kes iro li Swêdê dijîn û ji wan 3.000 li komuna Botkyr kayê dijîn.

Ez kaseteka Kurdêñ Konyayê jî we re dişinim.

Sipas ji bo we ku hûn alîkariya gelê Kurd dikin

Kurdeki Konyayê

## HELWEST

### Kovara Çand û Edebiyata Kurdi Hejmara 2'em derket

## Adresa xwestinê

Tensta Alle 43- 2 tr.  
163 64 Spånga-SWEDEN

Tel-Fax: 08-7618433

Anons

## Rohat Alakom

### Bir Kürt Diplomatının

#### Firtinalı Yılları

#### General

Şerîf Paşa  
(1865-1944)

#### Adresa xwestinê

Rohat Alakom  
Pilvingegatan 17  
128 35 Skarpnäck-SWEDEN

Armanc

Rojnameya Kurdî ya  
Mehane  
&  
Aylîk Kürtçe Gazete

Li ser navê Weşanxaneya  
Çarçirayê Xwedî û  
berpirsiyar (Çarçira Basın  
ve Yayıncılık Ltd. Şti.  
adına Sahibi ve Yazışları  
Müdüri):  
Nesih Çilgin

Redaktorê Berpirsiyar:  
Remzî Kerîm

Redaksiyon:  
Mumtaz Aydin  
Faris Can  
Mûrad Ciwan  
Nihat Elî  
Ehmed Huseynî  
Yakûp Karademîr  
Mahmûd Lewendî  
Hesen Mizgin  
Emîn Narozi

Berpirsiyarê beşê Dimili:  
Malmîsanij

Şertîn Abonetiyê

Abonetiya Salekê

Türkiye: 400.000 TL  
Skandînaviya: 250 SKR  
Ewrûpa: 60 DM  
Derveyî Ewrûpayê: 50 \$

Anons / İlan  
Nîv-rûpel  
5.000 000 TL  
2500 SKR  
500 DM

Hesab No:  
0017880 - 6 / BU6 / 01  
Yakup Karademîr  
Akbank T.A.Ş  
142 Aksaray-Ist.

#### Adres:

Guraba Huseynağa Mah.  
Dağarcık Sok. Mehmet  
Han No: 327B, D:23  
Aksaray-İstanbul Türkiye

Tel-Faks: 212-6312515

Adresa Ewrûpayê:  
Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden

Tel: +46-8-803135  
Faks: +46-8-801825

Hesabî Ewrûpayê:  
Postgiro: 497255-6  
Sweden

2 kitêbên nû

Mûrad Ciwan

## Rojev

## Ma însan mexlûqatekî siyasî ye?

Nalîn Baksî keçeka Kurd e. Pişti darbeya 12'ê İlônê, di umrekî piçûk de bi malbata xwe re hat, li Swêdê bicîh bû. Li Swêdê mezin bû, xwend, kar kir, bi siyaseta nava Swêdê mijûl bû. Di nava ciwanê sosyaldemokraten Swêdê de bi zîrekî têkoşin da. Di hilbijartinê parlamentoye de ku sala 1994'an pêk hatin, weka parlementer hat hilbijartîn û di nav listeya sosyaldemokraten Swêdê de ket parlamentoye. Di demeke kurt de, serkeftineka hêja... Ne tenê ew û malbata wê, hemû Kurdên Swêdê bi vê serkeftinê kêfîxwes û serbilind bûn.

Demekê berî niha, di kanalekî televîzyona Swêdî de, programek belav bû ku Nalîn Baksî jî tê de besar bû. Min ew program bi meraq û 'heyecan temaşe kir. Tê de Nalîn Baksîyê teqrîben wiha digot: Ez berî her tişti xwe ne weke keseka xerîb a penaber dibînim ku hatiye li Swêdê bicîh bûye, berî her tişti ez xwe weka yeka sosyaldemokrat dibînim. Di jiyan, kar û xebata min de sosyaldemokratiya min berî xerîbiya min tê.

Nalîn Baksî li dijî wê bû ku gellek caran xerîbiya wê li ber çavan dihat danîn û pir-sen li ser vî warî jê dihatin kirin. Wê rexne li wan kesan digirt ku di serê her gavê de xerîbiya xwe an neswêdiya xwe derdixistin pêsiyê. Rexne li parlementereka din digirt ku endameka partiya kesk bû û diya wê Swêdî û bavê wê Filistînî bû. Li ser wê digot ku tevlî ku him ji alî diyê him jî ji alî bavê ve ez ne Swêdî me û tevlî ku ew nîswêdî ye, ez dimînim ecêb ku ew jî min pirtir weka yeka biyanî xwe derdixe pêş. Nalîn Baksîyê li ser "mewqufê şas" ê vê parlementer mîsâlek wiha jî dida: Em yêni bi tevayî biyanî, xwe muhtac hîs nakin ku di serê her gavê de biyanîtiya xwe derxin pêş. Yêni ku bi tevayî ne biyanî ne jî me pirtir biyanîtiya xwe derdixin pêş. Li Kurdistanê hin musulman hebûn ku ji filetiyê vejeriyabûn ser musulmantiyê. Ev ên wiha, ji me musulmanen ku ji bav û kalan de musulman bûn pirtir û hiştîr xwe bi esasen musulmantiyê ve digirtin, di parastina musulmantiyê de, ji me sortir û dijwartir bûn. Wan pirtir ihtiyac hîs dikir ku musulmantiya xwe derxin pêşberê xelkê.

Min nevê ku ez serê gavê penaberî an xerîbiya xwe derxim pêş. Di parlamentoye de gava ku ez kar dikim, di dereca pêşîn de ez xwe ne weka biyaniyekê lê weka sosyal demokratekê hîs dikim.

Axaftineka bi vî awayî, ji bo min geleki Aalkê hat: Keçeka Kurd, li Kurdistanê ji diya xwe bûye, ev panzde sal in ku tevî malbata xwe li Swêdê dijî, iro di parlamento Swêdê de endam e, xwe berî her tişti ne weka biyaniyekê lê weka sosyaldemokratekê hîs dikim. Aciz dibe ku penaberî û biyanîtiya wê derdixin pêsiyâ sosyaldemokratiya wê.

Gava ku yek rabe bêje ez xwe wiha hîs dikim, helbet cihê axaftinê gellek namîne. Çimkî kesen din ci dibêjin bila bibêjin, ya muhîmtir ew e ku merivek xwe ci hîs dikim, xwe ci dibîne. Loma jî helbet tiştekî meriv ê zêde namîne ku meriv ji Nalîn Baksîyê re-ji wê bi xwe re-bibêje.

Lê ev axaftin bi giştî serê min mijûl di-

ke. Ez difikirim, axaftineke wiha gelo he-ta ci derecê rast e?

Her di wan rojan de, meseleyek wekî vê, li Tirkîyê jî rû dabû. Li İstenbolê pişti hilbijartinê rêxistina CHPê ya İstenbolê he-yetek nuh hatibû ser idarê. Serokê CHPê Deniz Baykalî, bal dikişand ser wê yekê ku yên hatine ser hukum sunnî - yanî ne Alewî- ne û Tirk in. Ev, gaveka balkêş bû ji bo wî. Li ser vê gotinê, gellek rexne li Deniz Baykalî hatin kirin, ew bi şovenîzm û cudaxwaziyê hat tawanbarkirin. Baykal mecbûr ma, gavê baş de bavêje. Lê wê ga-va ku wî paşde avêt, bû wekî mesela uzira ji qebahetê mezintir. Wî iddia dikir ku bi wê balkêşanê xwestiye bibêje ku CHP idî partiye welê ye ku ji bo endamên wê Kurdistî, Tirkîtî, Alewîti an Sunnîti ne gi-rîng in, ya gi-rîng ew e ku hemî sosyal demokrat in. Di hilbijartîn de krîter, fîr û xebat in, ne ku Alewîti, Sunnîti, Kurdistî yan Turkîti ye. Wî iftîxar dikir ku ew berî her tişti CHPyî ne, sosyaldemokrat in. Denîz Baykalî bi axaftinê xwe dixwest CHPyîtiyê û sosyaldemokrasiyê bike per-deyek welê ku hemî xusûsiyeten etnîkî û kultûrî yên endamên wî veşere, bincil bike.

Ez fîkîrim ku çawa dibû du kesen ji hev gellek cuda, yekî zalim û yeka bazdayîa ji ber zulmê wekî hev difikirin.

Gelo ji bo siyasiyan çîma diviya bû ku berî her tişti meriv siyasi bûya? Çîma diviya bû ku meriv Alewîti, Kurdistî, Sunnîti an biyanîtiya xwe dernexista pêş? Gelô sosyaldemokrati û Kurdistî, Alewîti an biyanîtiya meriv dijî hev bûn rî li ber hev digirtin? Ma gelo meriv nikaribû ku him Kurd, Alewîti an biyanîtiya, him jî sosyaldemokrat bûya?

Heke meriv siyasi bifikire û heke siyaset jî ew siyaset be ku xwe bike amanc, hemî sert, hebûn û fîrsendan ji bo xizmeta xwe bikar bîne; menfeeta siyasi, hêz û hukum-kirin ji însanîbûnê dûr bikeve, ne di xizmeta bextiyarî, aramî û pêşveçûna însanan de be, bi eksî vê, însanan bike tabî û xizmetkarê xwe û serdestiyê li wan bike; di halekî wisa de, rast e, siyaset berî her tişti tê, xusûsiyeten însanîbûnê yên din. divê ji ber çavan wenda bibin; yan bêne tunekirin, yan bêne qedexekirin, yan jî bêne veşartin.

Lê heger însanbûn di dereca pêsiyê de were û siyaset bibe wasiteyek ku xizmeta bextiyarî aramî û pêşveçûna însanan bike wê gavê tu carî siyaset naake pêsiyâ xusûsiyeten din ên însanîbûnê. Wê çaxê meriv him dikare sosyaldemokrat yan CHPyî be him jî biyanîtiya, Kurd, Tirk, Sunnîti yan Alewîti be. Çimkî meriv "însan" e.

"Însan" ci ye gelo? Bi mucerredî ji alî nezerî ve dibe ku meriv bîbêje însan heywan an mexlûqatek e ku difikire, yan jî di-axêve. Para rastiyê di vê gotinê de heye, lê tarîfeka pir kêm û nezelal e. Welê di nava mij û dûmanê de ye ku tenê bi wan xusûsiyeten ez nikarim însanekî konkret bînim ber çavê xwe. Pir mucerred e. Li ba min divê tarîfa însan hîn gellekî muşexestir be. Çimkî di jiyanê û heqîqetê de însan ji wan tarîf û xusûsiyeten jorê muşexestir e û xwedan xusûsiyeten gellek zêdetir e. Gava ez dibêjim însan, însanî muşexxes, yanî şexsiyet(identity) tê ber çavê min. Weki

şexsiyet jî însan xwedanê gellek xusûsiyetan e. Bi wesileyeka din, li gorî xwe min însanî konkret bi vî awayî resimandibû: Ka bifikirin: Li Tirkîyê, însanek dikare jin, mîr an ji cinsiyeteka din be. Meriv zarok, ciwan, navsere yan jî extiyarek e. Kurd, Tirk, Ereb, Laz, Çerkez, yan jî ji milliyete-ka din e. Li gorî xwe zimanekî wî, dîroke-ka wî û kultureka wî heye. Musulman, Xiristiyan, Mûsewî, Êzidî yan jî ateist e. Sunnî, Alewîti yan jî Şîî ye, Hanefî yan jî Şafîî ye. Neqşibendî, Qadîrî, Nûrcî yan jî Wehabî ye. Laik e, yan jî dinperest e. Yan him laik, him Kemalist, him jîd îndar e. Belkî jî dîndarekî laik e ku ji Kemalîzmê hez nake. Karkir, gundî, bazırgan, karder, memûr, hunermend, telebe, sporhez, yanji bîkar e. Muhafazekar, liberal yan jî sosyaldemokrat e. Belkî nasionalistekî Tirk an ê Kurd e. Yan jî belkî, ummetxwaz, kozmopolitist an enternasyonalistekî welê ye ku hemû awe nasionalistiyê red dike. Belkî İstenboli, Diyarbekirî, Edirneyî an Adanayî ye. Li bajîr yan jî li gund dijî. Belkî li çiyê, deşte an li deveraka daristanî dimîne. Dibe ku alîgirê Galatasarayê, Fenerbahçeyê, an Beşiktaşê ye. Dibe ku ji futbolê, basketbolê, melevaniyê(avjeniyê) an ji siwarbûna hespan, ji gerra çolê, ji xwendîne yan ji berhevkirina pûlan hez dike. Belkî ji astronomiyê, icadîn nuh an remildariyê hez dike

Dolme, savar, fasûliyên hoş, çîgköfte Dan hamburger pê xweş e. Belkî ji de-wî, avê, araçê an wîskîyê hez dike û h.w.d. û h.w.d.1

Siyaset, di nava wê de jî sosyaldemokrati xusûsiyeteka însanan e wekî biyanîtiya penaberiyê, wekî Kurdbûn, Alewîbûn an Swêdibûn. Ya tebîi ew e ku însanek kîjan xusûsiyeten wî hene -bi şertî ku nikaribe xusûsiyeten însanen din binpê bike- bi serbestî bi hev re di wî de eşkere bibin, gulvedin û hevdü temam bikin. Gava yek rabe bîbêje ez berî her tişti sosyaldemokrat im, ne biyanîtiya, ne Kurd, ne Alewîti, ne Swêdî, ne jin an ne ciwan im, li ber çavê min tebîi xwiya nake. Wekî mesela wî fillehê ku bûye musulman, ez dikevîm hisseka welê ku nebe gello ew tenê musulmantiya xwe derdixe pêş ji bo ku kes filetiya wî ya berê bi bîra wî neyne.

Wê gûmanek ji min re çê bibe ku yan rejimî şiyasi yan pergala civakî vî kesî mecbûr dike ku hin xusûsiyeten xwe veşere an înkâr bike. Yan jî menfaeteka şiyasi, meqam an kariyerekê, çavê vî kesî welê tarîkiyete ku hin xusûsiyeten xwe li ber riya bilindbûna xwe asteng dibîne. Ev yek, car-din dere digihîje birîna rejima şiyasi an tevgera civakî ku vî şexsî mecbûrî vê yekê dike. Bi vî awayî li ber çavê min kîmasî û şâşî him di rejimî û pergâlêde, him jî di meriv xwedan idîyânen wilo de xwe nîşan didin. Kesen xwedan idîyânen wilo, yan wekî Deniz Baykalî zordariyê li xeyrê xwe, yan jî wekî Nalîn Baksîyê li nefsa xwe dikan. Her du hal jî cihê heyf û mi-xabînê ne.

1-Ciwan Murat, "Vatan, İnsan, Demokrasi", Realite; İstanbul, 22-28 Sıbat 1995, r. 5

Çiriya Paşîn 1995

Nûçe



**Leyla Zana xelata  
Saharov wergirt**

Parlamentera DEP'ê Leyla Zana ku nuha di hepsî de ye xelata Saharov wergirt. Xelata Saharov ji aliye Parlamento Ewrûpayê ve tête dayin. Grûba Sosyalist a Parlamento Ewrûpayê Leyla Zana ji bo vê xelatê pêşniyar kiri-bûn.

Ji sala 1989'an vir de xelata Saharov ji aliye Parlamento Ewrûpayê ve tête dayin.

Wek tête zanîn Leyla Zana ji bo Xelata Aştiyê ya Nobelê ji hatibû destnîşankirin û ketibû rojeva raya giştî ya cihanê û Kurdistanê.



Dilba

**Ji konê bêrtiya  
gihişt M tv**

Keçeka Kurd Dilbahar Demirbag ku 24 salîye bi singela xwe ya bi navê "Not Directly" gav avêt nav dînyaya muzîkê û cîgirt. Singela wê di nav muzîka soul de tê bi nav kirin, lê eslê xwe de di nav caz û soul de xetek e. Di nav muzîka wê de perdîn Kurdî yên veşartî mirov hîs dike.

Dilba li Xarpûtê di bin konê Bêrtiya de hatiye dinê. Di biçûkiya xwe de bi dê û bavê xwe re barkirine hatine Swêdê. Dilbayê tiyatroya xwendîye, xebata wê ya muzîkê di 18 salîya wê de destpê-kiyete. Nuha ji bo derxistina LP'eyekê dixe-bite. Bi singela xwe ya yekem bi nav û deng bû û di televizyon û çapemeniya Swêdê de cî girt. Bi klîpa xwe ya Not Directly di M tv'ê de jî derdikeve. Dilba di her fîrsendê de Kurdbûna xwe dide der.

# Raman

# Rewşenbîr, Ziman û Raman

Serdar Roşan

Di hejmara 1'ê ya Armancê de niviseke min bi navê "Rewşenbîr û Tabloyeke Rewşenbîren Kurd" hat çapkirin. Di wê nivîse de bi giştî li ser rewşenbîr û bi taybetî li ser rewşenbîren Kurd bi kurtî sekinibûm.

Di hejmara Armancê ya 3'an de nivîsek li ser nivîsa min ji alî Mahmut Kiper hat çap kirin. Min di nivîsa xwe de behsa kîmasîyan kiribû. Kiper rast dibêje, min pesnê kesî nedabû. Ji ber ku ez ji pesnan hes nakim.

Piştî ku min nivîsa Kiper xwend min xwe mecbûr hîs kir ku careke din nivîsa xwe bixwînim. Ji ber ku Kiper min di bin tawaneke giran de dihêle. Ji Melayê Cizîri heyâ bi iro ci ronakbîren Kurdish yên bi nav û deng hene li pey hev rîz kirine û her weha ji derxistina rojnameya Kurdî ya ewil Kurdistan heyâ bi salên dawiya 70'yî navê gelek kovar û komeleyan dide û dibêjefermo! Lî xelet e.

-Xeletiya yekemîn ew e ku ez behsa birek rewşenbîren niha dikim, ne yên sedsalên berê.

-Ya duwemîn, ez li ser çend nuxteyênu ku min balkêş dîtin rawestiyabûm. Min di wê nivîse de behsa têkoşîna kurdan ya tarîxî nekiyîne û di wê têkoşînê de ka rola rewşenbîran ci bûye min ne pirs kiriye ne jî li ser nivisiye.

Ez dê di wê nivîse de hewl bidim û bi şewekeke din li ser hin alîyen munaqşeyê mebesta xwe diyar bikim. Kiper li ser besê ewil ya nivîsa min hemfikir e; ji ber vê yekê ez dê bi çend nimûneyen berbiçav -bi hêviya ku ne "subjektîv" bin- di warê nivîsinê de li ser rewş û rola rewşenbîren kurd, li ser tradisyonâ fikirîn û nivîsina bi tirkî rawestim.

## Nimûne

Baş e, gelo ci ye ku Yaşar Kemal, Cemal Sureya û hin rewşenbîren kurdan yên ku berhemên xwe bi Tirkî didin ji hev cuda dike? Eger em bêjin kurdbûn her du teref ji ji hêla malbatê xwe ve Kurd in, ango ji hêla etnikî ve Kurd in. Lî ya balkêş ne ev e. Tişteku ez dixwazim li ser bisekinim û bi munaqşeyâ me ve eleqedar e hêla wan ya rewşenbîri ye.

Yaşar Kemal niviskar û rewşenbîrekî bi nav û deng e. Ne hewce ye ku li vir ez Yaşar Kemal bidim nasînê. Herçiqas Yaşar Kemal dibêje ez bi eslê xwe Kurd im, lê mîna ku tê zanîn Yaşar Kemal nabêje ez nivîskar an rewşenbîrekî Kurd im. Ew dibêje "ez niviskarekî Tirk im, ji ber ku

bi Tirkî difikirim û bi Tirkî dinivîsim."

Gelek nivîskar an rewşenbîren Kurdish jî yên bi nav û deng hene. Helwest û xebata wan ya siyasi eger em bidin hêlekî ew jî mîna Yaşar Kemal Tirkî difikirim û bi Tirkî dinivîsin. Lî ferqa wan û Y.Kemal ev e ku ew wek takekes mîna Kemal nabêjin "ez niviskarekî Tirk im." Baş e eger mirov van herdu aliyan, nimûneyan bide ber hev û bixwaze rewşenbîren Tirk û Kurdish jî hev cuda bike, gelo ci pîvan an krîter dê karibin alikariya me bikin, da ku em bi hindikahî be jî pîrsê zelal bikin?

Eger mirov bêje ka bi kîjan zimanî dinivîsin, bersiv: Bi tirkî ye. Eger mirov bêje ji kîjan etnogrûbîne, bersiv: Kurd in. Eger mirov bêje li ser ci dinivîsin, angobabeten nivîsen wan, bersiv: Civata tirk û kurdan; pirs û pirsgirêkîn kurd û tirkân. Eger M. Kiper hînek alikariya min bike, ji kerema xwe re van her du nimûneyan bide ber hev û karibe ji me re izah bike ka ev rewşenbîren kîne, kîjan civatê ne, ez dê kîfxwes bibim.

## Çend Weşan û Ziman

M. Kiper behsa çend kovar û rojnameyênu ku Kurdish di salên 70'yî de derdixistin dike. Kiper ji min baştir dizane ku piraniya wan kovar û rojnameyan -herçiqas çend rûpelên wan bi kurdbû jî- bi Tirkî bûn (Tîrêj ne têde). Helbet xebata ku hatiye kirin ez înakar nakim, piçük nabînim, an jî heqê kesê winda nakim. Ez bixwazim jî ez nikarim. Lî Kiper bi xwe jî dizane ku gava ev kovar derdiçûn angó di wan salan de xebatek berfireh di warê ziman, edebiyat, wergêra pirtûkan bo zimanê Kurdî, berhevkirina folklorâ me, kursen zimanê Kurdî an berhemên wek roman, çîrok nehatine derxistin; an xebatek ku bi rastî nîşanî mirov bide da ku mirov karibe bêje girîngîya ziman û kultura Kurdish hatibû fam kirin û vaye berhemên vê yekê. Li vir ez kesekî gunehbar nakim, lê ev realiteyek me ye. Ji lewra gava mirov van kîmasîyan diyar dike divê kesek li dijî xwe an wek êrişek şexsî fam neke; bi kîmasî mebesta min ne ev e. Ji hêleke din li gel ku bi ser re 15-20 sal jî derbas bûne, hîn jî ev tradisyon bi giştî nehatiye şikes-tin. Vaye çend nimûne:

1- Armanc: Mehane, Kurdî.

2- Welatî Me: Hefteyî, Kurdî.

3- Ronahî : Hefteyî, Tirkî-Kurdî (% 90 bi tirkî).

4- Roj : Hefteyî, Tirkî- Kurdi

(% 90 tirkî).

5- Özgür Polîtika: Rojane, Tirkî.

Rojnameyênu ku herî pirr têne xwendin ev in. Ev rojnameji bo ku Kurd bixwînin têne derxistin; -û Kurd dikirin û dixwînin- ne jîbo Tirkân. Yen ku di van rojnameyan de dinivîsin piraniya wan Kurd in û xwe wek rewşenbîren Kurdish qebûl dîkin. Baş e, eger em piştî 300 salan karê ku Ehmedê Xanî bi cih anî, ew xebata ku em Kurd hemî pê serbilind in û îsal bi şeweyê cur bi cur piroz dîkin û konferansan, seminaran li ser didin; hildin û bi rewşa rojnameyênu ku Kurd derdixin û rewşenbîren Kurdish lê dinivîsin bidin berhev, gelo çiqas em nêzîkê raman û daxwazê Ehmedê Xanî ne? Berî herkesi divê rewşenbîren Kurdish lê bifikirin. (Objektîv: Eger em Kurdênu ku li Bakurê welêt dijîn wek bingeh bigrin û li rewşa weşanê Kurdî, roman, novel, kovar, rojname pirtûken ku li ser babetên cuda hatine nivîsin, wergerandin angó yênu ku bi Kurdî hatine çap kirin hemiyan bidin ser hev gelo dê hejmara wan çiqasî be? Eger em nifusa Kurdênu Bakûrê minimal bigrin, bêjin 10 milyon ku ji vana bi sed hezaran xwende ne, bi hezaran université xilas kiriye, ji her meslekî Kurd hene; gelo ji vana çend prosent xizmeta kulturnû zimanê Kurdî dîkin? Herhal mirov nikare bi bersiva van pirsan dilxwes be. Lî ci mixabin ku gelej ji wan di xizmeta kultura Tirkân de ne, bi Tirkî pirtûken cur bi cur dinivîsin.)

Pirrê caran di dan û stendina insanan de ziman wek aleteke basit tê fam kirin an jî izah kirin. Ez bi xwe ne zimanzan im. Lî ez ne bi vê yekê re me; û bi a min îzaheke basit e. Mimkun e ji bo şagirtên dibistana destpêkî tiştekî ifade bike. Lî tu qiymeteke wî ya zanistî nîne. Ziman him di prosesa netewebûnê de xwedî roleke giring e; him jî di tarîxa kultur û pêşdeçûna têkiliyên civatan de roleke sereke dilize. Ji ber van hoyan an jî ew rola ku di prosesa vejîna kultur û hestê meteweyî yêni kamilbûna neteweya Kurd de hildide ser milê xwe bi tena serê xwe bes û zêde ye ku em giringî û pêwîstîya zimanê xwe yêzikmakî di xurtkirina kultur, edebiyat û hestê neteweyî de fam bikin û cihê pêwîst jê re peyda bikin.

Ez Kiper fam dikim û min di nivîsa xwe de zehmetiya vê yekê diyar kiribû. Ango Kurd him li welatî xwe him jî li derive di şer-tîn xirab de jiyana xwe didomî



nin. Lî bi qenaeta min ev yeka han divê nebe sebeb ku em li hember kîmasî û xeletiyêne xwe bêdeng bimîn. Eger min rexneyek li rewşenbîren Kurdish girtibe, armanc ne ew e ku ez hinekan bişenîm. Bi qenaeta min hin kîmasî û xeletî hene û ji bo munaqşeyâ wan min ramanen xwe anîn zîmîn. Wek min di vê nivîse de jî diyar kir divê hin krîteren rewşenbîri hebin. Helbet çarçewekirina van krîteran zehmet e. Lî ez meraq dikim gelo ci krîter di cudakirina rewşenbîren Tirk û Kurdish de di şertîn Tirkîye û Kurdistanê de hene? Wek nimûneya ku min li jor nivîsi, nuha gelej kes hene ku bi eslê xwe Kurd in, lê xwe rewşenbîre civata tirk dizanîn û bi Tirkî difikirin û dinivîsin. Hin Tirk jî hene ku bi kîmasî bi qasê Kurdish li ser pîrsa Kurdish disekinin, ji bo vê yekê zîlm û zordariyê dibînîn û ew jî rewşenbîren Tirk in. Li hêla din rewşenbîren Kurd hene, bi eslê xwe Kurd in, dibêjin em Kurd in, li ser pîrsa Kurdish xebatî dîkin û ew jî Tirkî difikirin û Tirkî dinivîsin. Baş e, li vir tu kîmasî, tevlîheviyek tune ye? Aya mirov dikare van tevlîheviyan te-nê bi şertîn dijwar û asîmîlas-yonê izah bike? Li derveyî welêt jî asîmîlaşyon heye, çawa bi ci şeweyî domdike?

Helbet zimanzan û rewşenbîr

ne eyni tiş in. Mimkun e hin nuxteyêne hevbes di navbera wan de hebin; lê ev nayê wê maneyê ku her rewşenbîr zimanzan e, an jî her zimanzan rewşenbîr e. Li ser vê yekê li hev kirin dijwar e û rasterast bi munaqşeyâ me ve têkiliyêne vê yekê tune ne. Ya ku ji min re balkêş e û ez lê difikirim di çerçeweyâ pîrsa millî de, ji bo me Kurdish, rol û giringiya ziman û bi vê mijarê ve têkel rola rewşenbîran e. Gelo di prosesa geşkirina kultura civata Kurd de angó nivîsina roman, novel, çîrok, şîr, di munaqşekirina ramânê cur bi cur de, di dan û stendinê rojane de, di şikestina asîmîlas-yonê de, di prosesa fikirrandina van babetan û hwd de rola ziman heye an na, eger hebe gelo li vir rola rewşenbîran heye an na, eger hebe aya rewşenbîren Kurd yên bi Kurdî nanivîsin xwedî helwesteke rast in?

Siyasetmedarênu Kurdish an rewşenbîr û xwendeyênu wan pirrê caran behsa neteweyê Kurdish dîkin. Behsa neteweyek ku weletê wê parçekirî tê kirin. Em dizanin ku rewşa siyasi dest nade ku Kurd li ser axa xwe têkiliyên normal bi hev re çêkin û yekitiya xwe bi her awayî pêk bînin. Ev yeka hanê tê famkirin. Ji ber ku bê raya Kurdish ev yeka hanê bi darê zorê pêk hatiyê. Lî eger



rewşenbîrên Kurdan bi zimanê neteweyê serdest binivsîmin, gelo dê çawa karibin ji hev fambilikin, dan û stendinê fikrî û kulturî bîkin? Gelo di vî warî de çewtî û xeletiyek nîne? Ji xwe barê me Kurdan ji ber sê cure nivisêñ elfabê giran e. Bi ser de em çend zimanê biyanî jî lê zêde bikin herhal ne karekî praktik û mantiqî ye! (Xuyaye ji bo ku kurdêñ perçeyen din ji bo ku karibin rojnameyên ku Kurdêñ Bakur derdixin bixwînin û jê fam bikin, divê ew bi awayekî férê Tirkî bibin, an jî divê ew rojname hin rûpelên xwe ji bo férbûna zimanê Tirkî vejetin!)

Dewletêñ dagirker ji bo kurdan asimile bikin ci ji destê wan tê texsîr nakin. Li dibistanan ev mekanizma tê bi kar anîn. Pirtûk, kovar, rojname, radyo, televizyonêñ Tirkî, jiyanâ siyasi û civakî ya neteweya serdest di prosesa mehandina kurdan de hemî bi hev re rola xwe ya negatif dilizîn. Li gel vê rewşem em kurd jî kovar, rojname û pirtûkêñ xwe bi zimanê tirkî diwesînin. Kurdêñ ku Tirkî nizanîn em wan mecbûrê férbûna tirkî dîkin. Eger prosenteke pirr piçûk be jî em bi xwe jî besdarê kare mehandina kurdan dibin. Ji hêlekî em li dij asimilasyonê radwestin, zilm û zordariyê dibînin; ji hêla din em bi xwe jî vî karî dîkin! Ji hêlekî em ji kurdan daxwaz dîkin ku kurdî férbîbin, lê ji hêla din em bi xwe bi Tirkî difikiyîn û dînivîsin. Wek ku li nav xelkê tê gotin: Divê em ji xelkê re bêjin: Bi a me bikin, wek me nekin. in...)

## Rewşenbîr

Vêca kî xwe rewşenbîr dibîne an kî rewşenbîr e ji min re ne giring e, ne jî balkêş e. Yen ku bi karê raman û nivisînê(raman, ango na- veroka nivisan û zimanê ku mirov pê dînivise du kriteren berbiçav in ji bo rewşenbîrêñ civatekî) ve mi-jûl dibin û helwesteke wan di parastin û xurtkirina kultura neteweyî de û di warê zimêñ de heye, ya ku ji min re balkêş e û birek ji wan ku ez behsê dikim ev in. Wek min di nivisa xwe ya berê de jî gotibû li vir li ser take rewşenbîran nanivîsim. Bi giştî behsa kategoriye û helwesta wan dikim. Eger piraniya rojname, kovar, pirtûkêñ babetê cuda bi kurdî bihatana nivisîn û derxistin û hejmara dijberê vê yekê istifsa bibana xem nedikir. Lî çi heyf! Helbet ev nayê wê maneyê ku hin rewşenbîrêñ kurdan xebatekî hêja nakin. Ne hewce ye ez pesnê wan bidim. Ew bi berhemêñ xwe ve, xebata xwe ve têz zanîn.

## "Çep û "internasyona- lîzm"

Di nivisa xwe de ez li ser bireke rewşenbîrêñ "çep" yêñ ku ji aye- tan hesdikin û "internasyolist" in rawestiyabûm. Kiper ji vê yekê aciz bûye û dibêje ma em hemî lê nagerin ku pirsa kurdî enternas- yonalize bikin. Belê rast e, em lê digerin ku pirsa têkeve rojeveke

navneteweyî. Lî ya ku min behs kiribû ne ev e. Li gor min eger mirov tarîx, kultur û herweha rewşa xwe anga neteweyê xwe, civata xwe nizanibe û lê nekole mirov nikare di warê pirsêñ navneteweyî de jî xwediyê helwesteke hev- dem û bi şexsiyet be. Eger Kiper kovarêñ ku Kurdan heya bi çend salan berê jî derdixistin veke û ew munaqşeyen ku li ser pirs û pirs- girêkîn hin dewletan me dikir bi- bîne dê armanca min fam bike. Ji hêleke din min berê jî got û care- ke din dubare dikim. Eger wek nimûne bibêjîm gelek rewşenbîrêñ kurdan hene ku Marks, Le- nîn, Mao û yêñ mîna wan ezber dizanîn û wextê wan hebû ku bi- bin marksolog, lê jî xwe nabînin an jî ji ber ku hestêñ wan yê neteweyî zeif in fêri zimanê neteweyî xwe nabin!?(Mebest ji fêri ziman -li vir- bi ziman fikirîn û ni- visîne. Helbet bi zimanekî ku di warê nivisînê de pirr nehatiye xurt kîrîn, hîzîr kîrîn û nivisîn ne karekî hêsan e û ji ber vê yekê ji bo me kurdan ji gelêñ xwedî dew- let an dezgeh dijwartir e. Lî ev rewşa heyi divê nebe sebebê ku em li hêcetan bigerin ji bo férne- bûna zimanê xwe yê zikmakî. Herçiqas rewş welê be jî, li gelek deveran Kurd bi zimanê xwe yê zikmakî dipeyîvin, me edebiyatek kilasîk heye, gelek kovar û rojname di vê sedsala dawî de hatine çap kîrîn; zimanzanêñ kurdan bingehêk jîbo gramera Kurdi da- nîne. Ango kesê bixwaze Kurdi férbîbe gelek materiyal li ber dest in...)

## Ayet"

Helbet wek herkesi Kiper ji azad e, hanan ji bo fikra xwe referens nîşan bide û bi vê awayî fikra xwe an tezekê îspat bike. Referens an ramanen ku mirov jî isti- fade dike bi gorî babetê nivisî têne guhertin; lê wek tê zanîn tez an ramanek eger li ser bingehê rewşa reel, ango fakta û belgeyan neyê ava kîrin ne xwedî ehemîteke zêde ye. Ji lewra divê mirov malzemeyî propaganda û faktayê ji hev cuda bike. Ya ez dibêjîm ev e, ya din dibe pirseke baweriye, ango ji ber ku filankes an bê- vankesê gotiye an nivisiye ji ber vê yekê mirov bawer dike û ji bo xurtkirina baweriya xwe an jîbo iknakîrîna kesê dijberê xwe mirov ji pêxemberen ramanan ayetan rîz dike an zikir dike. Ayetan min behs kiribû ev in. Lî herkes di ba- weriya xwe de serbest e!

Bi kurtî: Ji bê sebrî an ji bê tec- rubeyî min bi xwe jî carina beş- têñ(maxêñ) xêñ jîmartine. Ji ber pirsa Kiper li ser babeta îdeoloji- gotina tiştekî zêde hewce nabînim. Di şertîn welatê me û civata me de rola îdeolojiyê ku li ser berjewendiya çînî radiwestin û helwesta xwe ya siyasî bi vê yekê didin pêş an diyar dikin ji min re ne balkêş e. Bi a min iro roleka wan ya girîng jî nîne.

□

# Neynik

## Hilbijartin '95

### Faris Can

**E**dî gelê Tirkîye û Kurdistanê ketine atmos- fera hilbijartînê. Ci partiyen hukumetê ci jî yêñ muxalefetê êdi hemfikirin ku di 24'ê Çileya Peşin de hilbijartîna giştî ya parlamento ya çêbe. Bi nêzbûna eşkerekirina namze- têñ partiyen û zelalbûna tifaqen di nav partiyen de, ji partiyen vegetandin çedibin. Partiyen ku di civatê de marjinal in û di hilbijartîna 91'ê de bi tifaqan ketibûn meclisê û dîsa vejeriyabûn partiyen xwe, wer xwiyaye di vê hilbijartînê de jî dê vê metodê bi kar bînin.

Partiyen Tirkîye û tevlîheviyeke mezin de ne. Gelek parlamenteñ DYP'ê ji wê vejetian û ketin ANAP'ê. Parlamenteñ CHP'ê ber bi DSP ya Ecewît ve diçin. DYP bi MHP'ê re di bazariya tifaqê de ye. ANAP him bi partiya paş- verû ya BBP ya Muhsîn Yazıcıoglu re dikeve tifaqê him jî hewldana tifaqa bi tevgera Cem Boyner de ye. Pişti ku ANAP'ê bi BBP re tifaqê çêkir, ku YDH ya Cem Boyner ji bi ANAP'ê re tifaqê çêke, Boyner dê prestijâ xwe li cem gelê Kurd wenda bike. Refah jî bi Partiya Demokrat a Aydin Menderes re ket tifaqê.

Dijminê gelê Kurd Sawciyê DGM ya Anqerê Nusret Demiral çû nav partiya faşist a Turkeş. Waliyên wek Hayri Kozakçioğlu û Unal Erkan ku li Kurdistanê kevir li ser kevir nehiştîn di DYP'ê de, brokrat û ekonomîstêñ ku aboriya Kurdistanê talan kîrin jî di ANAP'ê de namze- têñ parlamentoye ne.

**F**erqa partiyen muxalefet û iktidarê di warê meseleya Kurdî de wek ferqa coca cola û pepsi cola yê ye. Helwêsta piraniya partiyen ew e ku pirsa Kurdî bi darê zorê bête çareserkirin. Serokê YDH Cem Boyner di derheqê pirsa Kur- di de car carna mesejîn cesûr dide lê ew jî di da- wiya dawî de serê xwe ji Erkanê Herb re ditewîne. Ji ber ku ew jî sibê xurt bibe û bîkeve bin emrê Erkanê Herb ku ev dezgeh li ser her tiştiye, partiyen Tirkîye bê wê di warê çareserkirina pirsa Kurdî de nikarin tu gavî bavêjin.

Di cepheya kurdan de jî tevlîheviyeke heye. Di zemîna legal de 2 partî; HADEP (Partiya Gel a Demokrasiyê) û DDP (Partiya Demokrasî û Gu- hartînê) û PDK (Paltforma Demokratik a Kurd) hene. Ev hersê bask jî ji ber ku di avakîrîna HADEP'ê de li hev nekîrîn, ji hev parce bûn û her yekî bi serê xwe rîexistin çêkirin.

Li gor agahdariyan PDK ya Şerafetîn Elçi bi

CHP'ê re tifaq çêkiriye û Şerafetîn Elçi di liste- ya CHP'ê de namzete Şîrnexê ye. Yanê tişte ku di hilbijartîna 91'ê de HEP'ê bi SHP re kir, iro KDP dike. Heta nuha ne CHP'ê û ne jî KDP'ê ev tifaq an jî iltihaq beyan nekîrîne.

HADEP yek ji wan 14 partiyen e ku heq qa- zanc kiriye ku bîkeve hilbijartînê. Li gor agah- dariyan HADEP, DDP, BSP (Partiya Yekgîrî ya Sosyalist) û SIP'ê (Partiya Sosyalist a İktîdarî) bi hev re di vê hilbijartînê de bi navê Eniya Aşîti, Ked û Azadiyê hevkariyek çêkîrîne û di listeya HADEP'ê de dikevin hilbijartînê. Hin rewşenbîr û sendikavanan jî ciyê xwe di vê eniyê de stendi- né.

**L**ê aqilê merivî nagire ku çîma HADEP û DDP bi KDP'ê re tiqafe çêkin, lê bi yêñ Tir- kan re çedikin. Ya din cawa dibe ku Platforma Kurd bê qeyd û şert xwe di hundîre CHP'ê de diheline. Halbükî navê Kurd hebûna wê bû û ew bi vî navî ji partiyen din dihat cûdakirin. Ku CHP bi vî navî pê re ketibe tifaqe, wê demê tifaq mahneya xwe heye. Lî ne weha ye.

Hin endîse hene ku dîsa HADEP helwesta xwe biguherîne û hilbijartînê boykot bike. Ji ber ku wê di hilbijartîna herêmî ya 94'an de jî nem- zetîn xwe yêñ belediyan diyar kiribû lê di dawi- yê de hilbijartîn boykot kiribû.

**L**ê wer xwiya ye şansê kurdan tuneya ku îsal Kurdîn meclisê. Ji ber ku demografiya Kur- distanê serûbin bûye, Kurdêñ ku cî û warêñ xwe terk kirine navê wan di kutukêñ hilbijartînê de nehatina nivîsandin. Ligel ku ciwanêñ 18 salî îsal dikarin dengê xwe bi kar bînin jî, lê piraniya wan qeyda xwe çenekirine. Baraja hilbijartînê bilind e. Di şertîn iro de ji tevahiya Tirkîye û Kurdistanê %10 deng stendin zahmet e. Ji xwe partiyen wek CHP û DSP ku di raya giştîya Tirkîye de wek partiyen "cep" tên zanîn, dengen wan ji % 25-30 derbas nabin. İcar ev 4 partiyen ku bi hev re eniya hilbijartînê çêkîrîne di civata xwe de hîn jî marjinal in; tesîra wan di nav xel- kî de kêm e. Ev herdû tiş ji bo kurdan deza- wantaj in. Lî dezavantaja herî mezin ew e ku tevgera rizgariya Kurdistanê ya iro ji ya 1991'ê paşdetir e. Dibe ku gelê Kurd şîyar bûye, lê ew bi tirs û bi xof e.

Wer xwiya ye pişti vê tabloya jorîn, ya herî mantiqîtirîn ew e ku, Kurd bi namzeteñ xwe yêñ serbixwe besdarî hilbijartînê bibin û imkan heye ku çend kesan bişînîn parlamentoye.

24.11.95

## Li Tirkîyeyê rojnamevaniya Kurdi

**Hamburg Roja 10 Çiriya Paşin li Hamburgê ji aliyê Hev- kar û GWA St Pauli Süd. Bi na- vê li Tirkîyeyê rojnamevaniya Kurdi panelek hat amadekirin.**

Di panelê de Endamê Redak- siyona Armancê Mumtaz Ay- din, endamê redaksiyona Kur- distan Heute Mehmet Tanrıver- di, Nûnerê Ronahiyê Yakup Kahraman û Nûnerê Rojê yê Al- manyayê Kasim Aras besdar bûn. Özgür Politika ji hatibû vexwendin, lê ji wan kes besdar nebû.

Panelîstan rojname û kovarêñ xwe dan nasîn, qala zulm û zor-

dariya dewleta Tirk ya li ser roj- name û kovarêñ Kurdan û as- tengiyen pêsiya wan kirin.

Beşdarîn Alman û Kurd ji pa- nelîstan pirs kirin. Li ser pirseke beşdarekî Alman "Siyaseten Kurd dema nikarin werin cem hev, çîma rojnameyîn wan hev- kariyê nakin?" Endamê redaksiyona Armancê Mumtaz Aydin weha bersiv da: "Ji ber terora dewletê, astengen huquqî û be- lavkirinê rojnamegeriya Kurdi li Tirkîyeyê û Kurdistanê ne sekto- rekî bi qezenc e. Ji ber vê yekê sermiyandar li vî warî naxwazin perê xwe razînîn. Li welatê me

prensîbîn demokrasiyê nebûye kulturekî ku li hember serdestî û zulmê berxwedanê ronakbû û rewşenbîrân û serbixwe hebin. Li hember şîdet û terora dewletê ya li ser weşanan, bes hêzîn rîexistinî dikarin li ber xwe bidin. Ji ber vê yekê rojname û kovar- êñ Kurdan ku iro li Kurdistanâ Bakur derdikevin ci bigre hemû- yêñ wan ji rîexistinî siyasi piş- gitirî digrin. Ew çiqas ji politika û helwesten hêza siyasi ya ku jê pişgitirî digrin, serbixwe hereket bikin jî, di helwest û politika xwe de objektif bin jî, dîsa bi sinor e."



# Zanist û Teknîk

Amadekar:  
Hesen Mizgin

## Destcepî ji hormonên cinsî tê

Thomas Nielsen

Destcepî di malzarakê de dest pê dike. Kesên destcep ji mejiyê xwe seqet in, ji yên destrast zûtir dimrin û pirtir qeza derbas dikin an jî bi rehetî bela tê serê wan. Piştî lêkolînê bi salan lêkolîner gihiştine van encamên taybetî

Picasso û Einstein di warê xwe de dahî bûn, lê lêkolînan wisa diyar dike ku-kekî hemû destcep- seqetiyeye sivik a mejiyê wan hebû.

Seqetiyek sivik a mejiyî ku ji ber zûtir ji dayikbûnê dike, dikare bibe sebeba kesên ku bikaranîna destê cepê tercîh dikin, bigihije % 10'ê nifusa gel. Izaha din a destcepîtî ew e ku destcepîtî hêj di malzarak de dest pê dike, ji ber ku hormonên zêde yên nêr pêşdeçûna nîviyê méejiyê cepê di din rawestandinê. Nîviyê mejiyê ku destê rastê idare dike yê cepê ye.

Êsandina ji dayikbûnê û teoriya hormonên cinsî iro ji bo sebeba destcepîyê izahîn normal in. Lî belê rastiyeke li dijî iddia yekmîn ku destcepîtî bi seqetiyeye sivik a mejiyî tê izahkirinê ye. Libervasiyê vê di hin waran de ferqa destcepî û destrastiyê pir kêm û gelek caran kesên destcep hitiştan ji kesên destrast baştı hel-dikin an jî di hin waran de qebiliyeta wan zehftir e, wek nimûne ji mirov dikare Einstein, Picasso û Leonardo da Vinci 'ide. Her sê ji dahiyên destcep bûn.

Li gor psikologê Amerikî Stenley Coren kesên destcep ji kesên destrast 5-10 salan këmtir dijîn.

Ji bo vê jî du izahîn S. Coren he-ne; ji alîkî dinya ne ya destcepaye, ji alîkî din jî hormonên cinsî yên nêr testost e tenê tesîr li pêşdeçûna mejiyî dike, parastina tabîya laşê mirovî li dijî nexweşinan jî zeif dixe. Li gor S. Coren tes-tosteron sebabâ hem destcepîti hem jî jiyana kurttir e.

### Ziman di nîva mejiyê cep de ye

Mejiyî ji kûreyên nîv pêk tê, nîvê cep û nîv rast e. Bi salan e mirov dizane ku şopên rehêni mirov ku laşê mirov bi mejiyî ve girê dide ji orta mejiyî derbas dibe, ji ber vê nîvê cepê yê mejiyî aliye rastê yê laşê mirov idare dike û yê aliye cepê jî wek ling û milê cepê nîv rastê yê mejiyî idara dike.

Lêkolînê mejiyî yên nû eşkere kir ku herdu nîv mejiyî ji alî fonksiyonên psîkolojîk ên cûda cûda de hostatiya xwe hene. Nîvê cepê yê mejiyî bi fonksiyonên mantiq û ziman, ya rastê jî bi fêmkirina zeman, matematik, xeyal û hîs mijûl dibe.

Li ser ji bo ci ji dehan neh destrast in gelek izahîn kêm an zêde tije xeyal hatine pêşkêşkirin. Piraniya lêkolîneran di wê baweriyê de ne ku hezkirina maya destrastiyê ji dayikbûnê tê. Piraniya zarokên nûzayî dema destê xwe dirêjî tiştekî dikin an jî dixwazin destê xwe li ciyekî bixin destê xwe yê rastê bi kar tînin. Ev tevgera han piştgiriya teoriya li jorê dike. tevgera destê rastê wisa xuya ye ku ne girêdayî hînbûnê ye.

Sebeba ku pirani dixwazin destê xwe yê rastê bi kar bînin, hebûna merkeza zimên li nîvê cepê yê mejiyî ye, di rêvebirina prosse-én zor û zimanî de ji xwe ve hoste ye û ev hostetî di idarekirina tevgeren têkilhev ên mil û tiliyan de tê bikaranîne.

Herçiqas ev teoriya han izah-

ke mantiqî dide destrastiyê jî nikare izaha ji bo ci ji % 10 dixwazin destê xwe yê cepê bi kar bînin, bide. Di derheqê vê de di nav lêkolîneran gelek dîtin hene.


### Hemû destcep cewî ne

Li gor dîtina yekem hin kes destcep dibin ji ber ku herdu nîv mejiyî hatine guhertin yanî merkeza zimanê wan ji dîlva nîvê cepê di ya nîv rastê yê mejiyî de ye. Bi riya tevzandina nîvê mejiyî ev teorî di hin kesan de hat cerbandinê. Bi vê metodê mirov dikare bi ewleyî pê bizanibe ka kanîna zimên di kîjan nîv de ye. Ji ber ku dema mirov nîveke mejiyî ku kanîna zimên têde ye ditevizi-ne mirov kanîna peyvînê wenda dike. Lêkolîn nîşan dide ku ji % 15 yên destcep merkeza xwe ya zimên di nîv rast ê mejiyî de ye. Lî belê ji % 80 yên destcep ev teorî derbas nabe. Hin rastî nîşan didin ku kanîna zimên li her aliye mejiyî wan belav bûye, lê wek adetî ev kanîna ha tenê di nîvê cepê yê mejiyî de ye.

Li gor dîtina duwem cêwiyeji yek hêkê neynika hevûdû ne, wek nimûne mirov dikare lif-dana(xwarbûn) por bide. İddîa ew e ku cewiyeji yek hêkî bi afirandina du goşpareyûs(em-piryo) neynika hevdû pêk tê. Ev tê wê manayê ku yek ji cêwiyan dibe destrast û yê din jî dibe destcep.

Li gor vê teoriye lêkolînerin hînek din jî pêşde diçin û iddiâ di-kin ku destcep nayê dinê di destpêka avakirina empiryo de hêka xwe ya cewî hevûye. Ev ce-wiye ha ji çend mîlîmetreyan di-rejtir nebûye û ji ber vê yekê jî nehatiye dîtin.

Ji Illustrerad Vetenskap  
Hej. 12. December, 1994



Nîviyê rastê yê mejiyî bi fêmkirina zeman, mekan, matematik, xeyal û hîs mijûl dibe

Kesên destcep ji alî zimên ve gelek caran ji kesên destrast baştı in. Ji ber ku merkeza zimên di herdû nîv mejiyî de jî belavbûyî ye

## Internet

Sahînê B. Soreklî

D i sedalsa 20' em de zanistî ewqas pêşve çûye ku se-deyeke bêhempa de hat guhertin. Hele careke bifikire ku 150 sal berê tren tunebû 150 sal li du çêkirina trênan yekem mirov dest pêkiriye satelîten gerdûnî bigihîne stêrkân asîmanê. Hema 20 sal berê, egerbihata gotin, mirov dikare tevahiya nîvîsanar di rojnameyekê de di nav çend saniyan de ji aliye cihanê bigihîne aliye din, ma gelo dê insan bawerbikira. Belê teknolojiya iro li holê ye tenê dikare nameyên me di cih de welatekî bigihîne welatekî din, ne tenê dikare dengen me bi telefonen satelîtan bigihîne hev, ne tenê dikare wêneyên bûyaran bi riya televizyonan di eynê deqîqeyê de li hemû besen cihanê û heta li asîman bide belavkirin, lê dikare peywendiyeke elektronî, danûstendineke bi kompiyûtorê di navbera mirov cihanâ me de pêk bîne. Ev teknoloji ne tenê ji bo dewletan û ji bo dewlemdan lê ji bo her kesî, bi kêmâsi ji bo hemû kesen li welatên pêşveçûyî dijîn li holê ye.

### Cihanâ li malê

Belê kompitor, makîneya faksê, telefonen destan şoreşek di jiyana mirovan de çêkirine.

Ev demeke ku li her derê behsa Super-Hiyhway tê kîrinê. Gelo ev Superhighway ci ye? Ew sistemek kompiyiterêye ku bi navê Internet tê nasîn. Bi riya Internet hem-welatiyê welatekî û xelkê cihanâ me dikarin di eynî deqîqeyê de li gel hev agahdariyan ji hev bigrin. Mirov dikare di hundirê mala xwe de bi cihanâ ku Internet lê heye re bide û bistîne. Internet sînorê cihanê radike û cihanê tîne hundirê odaya te.

İro 30 milyon kes li cihanê Internet di mal, dâire û xwendeghan de bi kar tînin. Li gor şirketa IBM heta dawîya sedalsa bisitan yanî di nav 5 salen dahatû de 550 milyon mirov dê sistemâ internet bi kar bînin.

Dibe ku hindek ji me, yên ku ji teknolojiya nûjen ditirsin, bibêjin, na bavo, ev ne karê min e! Di rastiyê de Internet ne tişteki tir-sandinê ye. Bi riya Internetê mirov dikare têkeve pirtûkxaneyen cîha, mirov dikare rojname, kovar û nûçeyan bixwîne, biletên trênan, balafran û şanoyan biki-re. Internet herweha posteyeke elektronî ye. Xwediyê sistemâ In-

ternet navnîşana xwe ya eletronî dide kesen peyweniya wî li gel wan heye, ew jî bi riya kompito-re nameyên xwe li ser wê navnîşan(e-mail) ji kompitora wî re re dîkin; yanî kompitor bi kompito-re re dide û distîne. Bi taybeti jî ji bo zarok û şagirtê xwendeghan û zanîngehan Internet cihaneketijî peroşî û heyecan e. Di derheqê gencen nebalix de tenê gelşek heye. Ew jî imkana bidestxistina agahî û wêneyên cinsî yên berbat e. Tiştekî din jî ew e, ku komên nîjadperest yê wek Naziyên nû dikarin nîvîsarên xwe bi reya kompitorê xwe têxin Internetê.. Şirketa internet nuha hewl dide ku riyekî ji vê problemê re bibînin.

### Ji bo Internet ci divê?

Ji bo bidestxistina Internet ci divê? Ji bo bidestxistina Internet kompitor divê, materyalê softwe-ar yê ji bo Internet girîng e û modem pewîst e. Modem kompitorê digihîne xeta telefonê.

Bingeha teknolojiya Internetê 40 sal berê hatîye holê. Ev sistem ji aliye şirketa Amerikî Rand Corporation di salen 1950' i de peyde bûye. Sedema bingehin ya afirandina vê sistemê ew bûye ku mirov bikaribe di dema êrşike nuklerî de li gel hev bide û bistîne, yanî hevûdûn agahdar bike û xwe ji zanistiyê bêpar neke. Wezareta Parastinê ya Amerikayê ew di sala 1969'an de bi kar anî û 4 zanîngehêne welêt bi riya kompitor gîhandin hev. Helbet dûre teknolojiya Internet firehtir bû. Bi riya Internet mirov dikare bibe endamê kom û meraqen cur be cur û li gel endamên din bide û bistîne. Mirov dikare herweha ji odaya xwe mesaj û tenbiyan ji kesen din re rîbikê ku xwediyen sistema Internet in. Di nav çend saniyan de, mirov dikare hevûdûn agahdar bike.

Yen ku di malen xwe de Internet bi kar tînin divê, pereyên bikarâna vê teknolojiye bidin. Li dû amedekirina kompitora xwe ji bo sistema Internet, divê mirov peywendiye xwe ligel şirketa Internet girê bide.

Eger Internet wek makineyê faksê û hacetên telefona destan bê bi kar anîn, ew jî dê di nav çend salen bê de, ne bi tenê firehtir bête bi kar anîn her weha er-zantir bibe. Internet rastiyeye ji-yana nûjen e û dê demeke nêzîk de bibe beşek ji jiyana me.

Nîviyê cepê ya mejiyî bi fonksiyonên mantiq û ziman mijûl dibe

Kesên destcep ji alî zimên ve gelek caran ji kesên destrast baştı in. Ji ber ku merkeza zimên di herdû nîv mejiyî de jî belavbûyî ye

# Kongereya 62'êm ya PENê çêbû

Kongreya 62'êm ya PENê piştgiriya wê yekê dike ku nivîskarêne Kurd, li ku dibin bila bibin, bikaribin berhemên xwe bi zimanê xwe bidin weşandin û piştgiriya parastina çanda gelê Kurd bikin.

Sidney Di navbera 26'ê Çiriya Pêşîn û 1'ê Çiriya Paşîn de li Awiştralya li bajarê Fremantle kongreya 62'êm ya Rêxistina Nivîskarêne Cihanê, PEN çêbû. Di kongreyê de wefdên ji welatinê Asya, Afrîka, Amerika, Awiştralya û Zelanda Nû û herweha nivîskar, helbestvan û rojnamevânê welatên cûda beşdar bûn.

Kongreya PENê bi axaftinê serokê navneteweyî yê rêxistinê

Ronald Harwood, Sekreterê rêxistinê Aleksandir Blokh, Serokê beşê bajarê Perth(rojavaya(Awiştralya) Joe O'Sullivan û Seokê Belediya bajarê Fremantle, Jennifer Archibald dest pê kir.

Kongreya îsal ehemniyeteke mezin da pirsa azadiya bîr û baweriyê. Kongreyê piştgiriya xwe ji bo nivîskarêne cihanê yên di gitigehan de diyar kir. Navê Yaşar Kemal û İsmail Beşikçi jî gelek caran di kongreyê de hatin telafuzkirin û tadayiyêni li ser nivîskarêne Kurd di raporan de hatin nivîsandin. Bi daxwaza berpirsiyaren PENê helbesteke Recep Maraşlı bi Ingilizî hat xwendin. Serokê Komîteya Mafêni Mirovan Borîs Novak ku herweha serokê PEN a Slovenya ye, pêşniyar kir ku nameyeke serfirazî ji

serokê PENa Kurdi Husêni Erdem re bête rêkirin ku nexweş e.


Di nav axaftinê di kongreyê de hatin pêşkêşkirin, axaftineke di bin sernivîsa "Weşanên giştî û azadiya nivîsandin" de ji aliye Şahînê B. Soreklî ku wek endamekî PEN a Sidney beşdar bûbû, hat pêşkêşkirin. Wî di axaftina xwe de bahsa nebûna azadiya gotinê li hemû perçen Kurdistanê û bi taybeti jî rewşa nivîskar û rojnamevanenê Kurd li Tirkiyeyê kir.

Wek hersal di kongreyê de îsal jî gelek biryar hatin girtin. Yek jî biryaran daxwaza rakirin benda 8'em ya "Antî-Teroror

yasası" bû. Bi taybeti wefdên Finlandiya, Danimarka û DYA yê daxwaza rakirin vê qanûnê û azadkirina nivîskarêne girtî kirin. Di kongreyê de ji beşdaran hat tîkakirin ku li welatên xwe lobî bikin, bila Tirkîye bêyi rakirin vê bendê di yekîtiya gumruga Ewrûpayê de neyê qebûlkirin.

Kongreya 62'êm ya PENê piştgiriya wê yekê dike ku nivîskarêne Kurd, li ku dibin bila bibin, bikaribin berhemên xwe bi zimanê xwe bidin weşandin û piştgiriya parastina çanda gelê Kurd bikin.

Di şeveke demderbaskirinê de mîvaninê ji welatên cuda di mûsabeqeyeke stranan de beşdar bûn. Strana Kurdi bi "Bêmal" û "Yek Mûmîk" xelâta yekem girt.



Bîstek ji meşa Bonê

## Di xwepêşandinekê de birayê piçûk bê xwedî ma

S. Safok-Bonn Di 21'ê Çiriya Pêşîn de li Almanyayê li bajarê Bonnê zêdeyî 500 kesen ji Kurdistana Sûriyeyê li pêşîya Bal-yozxaneya Sûriyeyê meş û mitin-gek li dar xistin. Meş ji aliye 4 partîyen Kurdistana Sûriyeyê; Partiya Demokrat a Kurd a yekîtiyê li Sûriyeyê(YEKÎTÎ), Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyeyê, Partiya Sosyalist a Kurd li Sûriyeyê û Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê hat amedekirin.

Armanc û daxwazên xwepêşandane ji van armanc û daxwazên gelê Kurd yên milî û gelemperî pêk dihat.

1- Azadkirina hemû girtiyen sisayîyen gelê Kurd ên ku di zindanê Sûriyeyê de ne.

2-Rakirina yasaya amar (serjimartin)ciwazî ya sala 1962'an û vegara pênasîyê li hevelatiyên Kurd.

3-Rakirina projeya kembera Erebî ya şovenî û vegera erd û zêviyê Kurdan li xwediye wan.

4-Piştgirtin û alîkariya pirsa Kurdi û pêkanîna daxwazên wê;

Qebûlkirina fermî ya gelê Kurd li Sûriyeyê wek neteweza duwem û tesdiirina wê di destûra Sûriyeyê de û pêkanîna mafê hemû gelê Kurd ê neteweşî li Sûriyeyê.

Lê mixabin birayen me yên Kurdistana bakur û başûr beşdarê meşa me nebûn.

Ev cara yekem e ku rêxistinê Kurdistana Sûriyeyê li dereveyî wêlêt li dijî balyozxaneya Sûri-

ye yeyê meş û mitîng çêdikin û daxwaza mafê xwe yên demokratîk û neteweşî din.

**Stokholm** Her weha ji aliye komîteya piştgiriya girtiyen siyasi li Sûriyeyê di 27'ê Çiriya Pêşîn de li Stokholmê şevez hate organîzékirin. Di şevê de Nasir Rezazî, Cûdî, Xoşnav û Seîd Rêzanî beşdar bûn.

Li ser navê komîteye di şevê de axaftinek hat kirin. Di axaftinê de weha hat gotin. "mara girtiyen ku ji bo pirsa hevwelatiyê iro di zîndanan de ne, li dora 30 kesî ye. Wek tê zanîn bili işkenceya bêrehmet, ev girtî karêne xwe wenda dikin, malbat û zarokêne wan li ber rehma Xwedê dimînin.

## Panela ser Yekîtiya Netewî

**Hamburg** Li Almanyayê li bajarê Hambûrgê di 11.11.1995'an de ji aliye HEVKAR û Senatoya biyaniyan ve panelekî hat organîzékirin.

Panelê bi axaftina serokê HEVKAR'ê M. Ali Yıldırım dest pê kir. Wî xêrhatina nûnerên partîyan û beşdaran kir. Dû re li ser navê Senatoya Biyaniyan axaftinek hat kirin. Wî di axaftina xwe de got: "Li Hambûrgê Kurd bi nufusa xwe grûba sêyem e, ew mafênu ku didin grûbêne din yên biyani, divê ji bo Kurdan jî bê dayin. Dema em dixwazin vêya bikin, Konsolosxaneya Tirkan û komeleyen wan me bi piştgiriya Kurdan súcdar dikin. Lê em biryare li ser kiriyarene xwe didin. Tehdîden wan wê me çavtirsandî neke".

Di panelê de li ser navê Platforma Yekîtiya Sosyalîstên Kurdistana (Kawa, KUK, TS, TSK, YEKBÛN) Davut Laşer, li ser navê PSK Kazim Xoce, li ser navê PDK-Iraq Mehemed Emîn, li ser navê YNK Ahmet Bamernî û li ser navê PîK'ê Hîkmet beşdar bûn.

Nûnerên partîyan li ser van pîrsan bîr û baweriyen xwe anîn ziman: Ji Kongteya Netewî ci tê fêm kirin? Kongreya Netewî çawa tê pêk anîn? Bi kî re û çawa tê kirin? Hêza wê ya temsildariyê û fonksiyona wê çawa be?

Herçiqas PKK jî hatibû davet kirin jî, lê ew beşdar nebûn. Bi tehdît û gefan xwestin civînê sabote bikin û xelk nece beşdar nebe.

## 12 kadirêne Partiya Karê Serbixweyî hatin kuştin

Hewlêr Li gor agahdariyê ku ji aliye Partiya Karê Serbixweyî Kurdistanê ve hatine dayin, 12 kadirêne wan roja 2.11.1995'an li ser riya Hewlêr û Koyê, li nuxteya kontrolê ya Tobzawe-Koyê ji aliye YNK ve hatine dîl girtin û piştre jî hatine kuştin. Di nav van kesan de endamê Buroya Politik Mehemed Hellaq jî heye, ku ew li Swêdê ciwar bûbû.

Ji bo kuştina hevalên xwe rîxistina Swêdê ya ve Partiyê di 19'ê Çiriya Paşîn de civînek li dar xist.

## Barzanî Ocalan dawetê Kurdistanê dike

Selhedîn Pitsî ku Serokê PKK'ê Abdulah Ocalan di MED TV'ê de got em amede ne ku bi Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî re rûnîn û li ser rawestandina şer guftûgoyan bikin, Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî bi nameyekê bersiva Abdulah Ocalan da. Barzanî di nameya xwe de dide diyarkirin ku ew amedene bi Serokê PKK'ê Abdulah Ocalan re rûnîn û di vê rûniştinê de hemû serokên rîxistin û partiyyen Kurdistanê din jî beşdar bin.

Lê şertekê Barzanî heye ku divê Abdullah Ocalan ji Şamê û Bekaa'yê derkeve û bê Kurdistanê û li Kurdistanê civîn çêbibe. Barzanî di nameya xwe de weha dibêje: "Heger Ocalan li gel milîtê xwe bi rastî dilsoz e, divêc ew ji bo carekê be jî ji Şamê û Bekaa'yê derkeve û nişan bide ku ew dikare bi serê xwe biryare bide ne ku hin wî idare dikan."

## Kurdistana Başûr

### Bêistiqrari berdewam e

Pîrsa şerê navxweyî ne bi hevdîtinê Dublinê û ne jî yên Tehranê çareser nebû û rewşa bêistiqrari her berdewam e.

Wek tê zanîn piştî hevdîtina Dublinê ya yekem hêvî çêbûn ku dê ev şer di demeke kurt de bi dawî bê. Lê piştî hevdîtina duwem, hate xuyakirin ku herdu alî jî ji lihevkinê dûr in. Piştî Dublinê hevdîtinê Tehranê dest pê kirin û wele hat xuyakirin ku vê carê pêşketin çêbûye. Lê cardin derket ku lihevhatineke ciddî hîn li dûr e.

Di 12.11.1995'an de berpîrsê herêma Kendavê yê hukûmeta DYAYê Robert Deutsch çû Kurdistanâ Başûr da ku pêvajoya Dublinê dewam bike û aştiyek pêk bê. R. Deutsch bi Mesûd Barzanî û Celal Talebanî re rûnişt lê ji daxuyaniyan tê xuyakirin ku ev hewldan jî hîn negîştiye derekê.

# Arî

û

## Antrepolojiya Nefretê

Prof. Carl Nylander

Têgliştina peyva "Arî", ku dê di sedsala me de derbasî nemirovayetiye û antropolojiya nefretê bibe, niha bi vî şerrê ciwanê zorker ê li dijî bîyanian, disa aktuel bûye.

Li Swêdê, bi awayekî têr û eşkere Hindî, irani (farîs) û Kurdên me bi mafekî rewa, dikarin bibêjin: "Em Arî ne".

Heke xwendevanê Gustaf Fröding [helbestvanekî swêdî ye Ş. Kaya] yê "Morgan Dröm" (Xeyalîn Sibê) desten xwe bidin ber rûyên xwe û baş bifikirin, dê fêm bikin, ku ew ne tenê şirovekirina evînekê ye, ku di demekê de bûbû sebebê skandal û rûmetşikandina adetan û xwediyê xwe xistibû nav kirîzeka psikolojik. Tişte ku em li ser disekinin ev e, ku Fröding bi zanîn an jî bê zanîn dema wan ya xweş di "Welatê arîan" de bi wan dide jiyan. Ji bo Fröding "Welatê arîan", behîsta ser rûyê cihânê ye. Li wir, "Xakekî beşerxwêş heye, ku Yezdanê rojê yê Arî, wê dihefidîne" û dibêje: "Arî, ew xelkên esilzade yê di dilê min de ne". Ew esilzadeyê ku divê mirowan ji xwe re ideal bigire.

Li niha peyva "arî" bûye rûreşî, nemirovayetî û derbasi antropolojiya nefretê bûye; ew doktorîna di derheqa nîjadê serdest û yê bindest de, ya di derheqa yê bijare û yê bêrûmet de û herwiha ya di derheqa nîjada Bakuriyan [mebest skandînavî ne. Ş. K.] de jî, jê derketiye. idîaya wan ya ku xwe ji nîjadê din bi esiltir dibînin ji vê dîtinê tê. Ji bo

me "Arî" ne xelkên ronahîbelavker ên pêşî ne. "Arî", ew mirdarê çavkesk in ku Paul Celans di helbesta xwe ya li ser kampê dîlitîyê, "Todesfuge" de dihîne zimên.

Lê ev çeteyêne nefretê, yê sercûzankirî û komandojen cilres niha terma "arîti" yê dîsan bi kar dihînin !

**L**i Swêdê, rôexistina "Berxwedana ariyen Spî" VAM heye û li Amerikayê jî "White Aryan Resistance" û "Aryan Nations" hene, ku niha bi êrişa Oklahoma ve dihîn girêdan.

Belê ev çawan bûye ku peyveka kevin, ya ïndoîranî di ferhengen nîjadperestan de bi awayekî welê fireh cîhekî navend girtiye ?

"Yekem car, pişti 1771-î, bi rastî cihan gilovertir bû". Ev wê çaxê hate kefş kirin, ango careka din ji nuh ve hate kefş kirin. Dayik-kontînentiya (dayikkita) Asyayê û navendiya wê, ya kultur û şarîstaniyê ji aliye firansiyekî, Anquetil Duperron ve, bi wergêra pêşîn ya nivîsarên Asyayê yê kevnare, Avestaya farisi, ku nîvê wê li ser jiyana mezinê Aryanî Zarathustrayê ku bingeha Zerdüşîyê daniye, ye. Çend sal paşê ji karmendê koloniyalizmê yê "şirketa" Rojhelata Hindistanê dest bi wergera nivîsarên Hindistanê yê klasik, wek tekstên sanskrit û belgeyên Bûdîzmê yê kevnare û herî girîng kirin. Hîdi sala 1784-an de, xala metafiziçkê ya guftûgoyen di navbera

Yezdan Krishna (Kirîşna) û betil Aryunas de ku di derheqa mirin, jîn û damezirandina cihanê de ye; eposa mezin "Mahabharata" [diwaneka helbestan el] yê wergendarin. Di sala 1789-de, şirovekirina Sir William Jones, ya li ser drama Khalidases (Xalidases) Shakuntala (Şakuntala) di demeka nêz de bi pênc cildan derxist. Hein, ji noten Şakuntala firsendê dît û ev ji bo Faust bû destpêka gesbûna belavkirinê. Bi saya van nivîsarên Orientalî (rojhilat) yê bi şewq, ji Ewrûpaya romantik re bû destpêka berbangeke qewî. Nekilasikî, ji çavkaniyê gelêri bûne xeyal. Li vir careka din ji, di navenda dilê Asyayê de hat kefş kirin, ku di nav dilê Asyayê de, ji Yûnan û Romê bêtir şarîstaniyeka gelêri, zîrekiyekê kûr û helbestvaniyekê bilindir hebûye.

Li gorî gotinê Herders yê di: "Xewnê Zarokayetiya Nijada me" de diviyabû êdî mirov ne bi Solon re, li cem keşeyen Misrî û li ber Nilê kevnare li wê ewlehiya pirr bigeriya û ew arezû bikira, lê bi tenê li ber qeraxên Ganges [çemek e, li Hindistanê] pîroz li nik brahmîniyan (keş) ew ewlehî bi dest diket. Ew kêt û sefa Orienta kevnare . . .

**L**î li wir, ji xeynî filozofîye ka kûr û helbestvaniyekâ bilind tiştên din ji hebûn. Sir William Jones di sala 1784-an de, balkêşiyen xwe yê epokçeker pêşkêş kir: Bingeha pevgîredanê [xizmî] di navbera sanskritî, farîsi, latîni, yûnanî, germa-



nî, keltî û slîvî [zimanen baltikî] de eşkere kir. Bi saya vê keşkirinê, zanyariyeke beseriya herî bilind û bi disiplin, ku niha bi navê malbata zimanen ïndoewrûpî dihê zanîn, çebû. Ev berheviana zimanen ya zanyarı, bi disiplîna akademisiyeniyeka bilind hatiye amade kirin û zaniyariya zimên e. Lê ev keşkirin bû destpêka aloziyên beseri û bi hêza xwe ya teqandinê ve têkili ol, siyaset, jiyan civatî bû. Ev termen wek "ziman", "gel", û "nîjad" bûn bobelatên tevlihev.

**D**i pey vê keşkirina ecêbîhiştî ya ronahîkirin û ji hev cudakirina zimanande, ku xwe ji Hindistanê diavêje ïrländayê û ïrländayê, sanskrîte kevnare ku ji nuh ve hatibû kefş kirin, ji aliye Jones ve bi vî awayî dihate karekterize kirin: "more perfect than Greek, more copious than Latin, and more exquisitely refined than either". Dibû ku sanskrîti ji herduyan ji kevintir bûya, belkî ji ber wê tevliheviya zimên ya di dema Babel [Babilîyan] de. Di vir de modeleke kevin, ya zimanê yekemîn xuya dikir. Heders bi "Ursprache" ditineka ku bû destpêka dirêjajotina guftûgoyen di derheqa zimanê Hz. Adem û zimanê Behîstê. de pêşkêş dikir. İbranî ketibû musabeqeyeke mezin û bixeter, ku dê hatina wêbihata kefş kirin. Diviya bû ku jêkdûriya zimanen ïndoewrûpî û yê samî bihata formule kirin.

Bi tesîra van nivîsar, werger û Hz. İsa bi 1000 salan maye. Ci-

weşanan, ku ji aliye yê wekî F. Schlegels "Ueber die Sprache und Weisheit der Inder" (1808) ve derdiçûn, di sedsala (1800) hijdehan de gelek entellektuel, rewşenbîr, helbestvan, filozof û xwenda, kêm-zêde bi awayekî giran di bin tesîra vê Asyaya ku ji nuh ve dihate keş kirin de diman. Ji Goethe bigire heta bi Höderlin, Novalis, Chateaubriand, Coleridge, Shelley û Wordsworth, Hugo, Lamartine, Balzac û Tolstoy, Heder, Schelling, Emerson, Almqvist, Schopenhauer, Nietzsche, Wagner û geleken din ji wan bûn. Di vê deme de, li Ewrûpâyê akademî û kursiyen zanistiyê, yê di derheqa Orientalî û Asyayê de hatin damazirandin.

**J**i bo Ewrûpiyan modeya herî bi hêz ew bû, ku sanskrîti bixwînîn. Lewra, ma dibû ku ev zimanê mirovayetiye yê yekemîn bûya? Hejmara kesen ku digotin: "divê di dibistan û xwendegahan de sanskrîti, têkeve cîhê yûnani û latîni" pirr bûn. Schlegel ji dixwest ku rêwingiya hunermendêñ ciwan, di dewsa Romayê de, ber bi Hindistanê ve bûya.

Lê yênu ku bi vî zimanê kevnare şor dikirin û pê nivîsine, kê ne ? Li gorî nivîsarên berhevoka hymnan, duayan, ku kevintirin belgeya Hindîyan e, di "Rigveda" (veda=zanîn, rîgveda=besen zanîn) yê de serekaktor "arî" ne. Berhem, ji demeka berî bûyina Hz. İsa bi 1000 salan maye. Ci-

**Li Swêdê, bi awayekî têr û eškere Hindî, İrani (Faris) û Kurdên me bi mafekî rewa, dikarin bibêjin: 'Em Arî ne'.**

**Ev çeteyê nefretê, yên ku xwe wenda kirine û bi cahilî bi pêş ve diçin, nizanin heke li Swêdê, "Arî" hebin; İrani ne, Zigenare (qereçî) ne, Hindî û Kurdên me ne !**

narênen wan jî İraniyê [Aryaniyê] rojhelat in. Li gorî Avestayê ji qiralen farisan jî li rojava diman.

"arîti" bi xwe rengdêreka zimanê ïndoîranî ye û di maneya "esilzade/esîl" de ye. Li gorî hymnan (duayan) Venedîkiyan, "Arî" nîvyezdanen ku di cengê de xwediyê moralekî bilind in û hertim ji cengê re amade ne ango Gorîyê yezdanan didîtin. "Aryani" egit in, dagîrkerin, çu paxavê nakin û Yezdan bi xwe jî, ji helwesta serkevtina wan xof digire.

**P**iştî kutabûna ji nuh ve kefşkirina kevnakultura Hindîyan û prestija sanskrîti ya kulturi li Ewrûpayê, di destpêka salen 1800-î de, di têgihîstina peyvîn "Arî" û "arîti" ye de, ji me re hêsanter dibe. Em dê wê çaxê tê bigihîjin ku van terman çawan cîhekî welê giring girtine.

Belê, pirs di derheqê nûneren ve kultura bi nav û deng û nirxigiran de bû, ku di dema romantikiyê de ji bo bêpirsiyariya zarakayetiya eslê xwe bike hat. Zarekî welê pêşkêş dikir ku ne ecêb bû ew bibuya dayika yan jî mezinxuska malbata van zimanen ku niha ji Hindîstanê gihayê heta Atlantikê. Wisan dihate xuya kirin, ku "Arî" pêşiyen wan gelên ku bi zimanek ji yên ïndoewrûpi diaxifin, bûn, ku niha mercen binemaliya wan derdiketin ortê. Ew "ari" yên dinamik, dagîrker û evîndarê serkevtinê, ji welatê bav û kalan yên kevnare derketine û ber bi aliye Rojava ve pijiqîne. Ez naxwazim bibêjim ên hemû cîhanê, lê bûne xwedanê Ewrûpa.

Bi vî awayî, inteseveya ji bo panîndizmê bê rexne li raya gişti rûnişt. Schlegel di sala 1803-ê yan de welê dinivisi: "Her tişt, belê bê awarte koka her tiştî li Hindîstanê ye !". Ramana lêkolinê li ser zimên û yên li ser ar-

keolojiyê, ya di derheqê navendiya cihê sanskrîti di nav malbata zimanen ïndoewrûpi de, bêhempayiya wî, rûmet û kevniya wî hate guhertin. Lê peyvîn "Arî" û "arîti" ye ji bo râwestinê hatibûn.

**B**ele, Îngiliz li Hindîstanê bûn, lê Silvestre de Sacy û Leonard de Chezy li Parîsê xebatên xwe wek hesten pêşî, pêşkêş kirin. Lê dîsan jî Almaniyen vî bereyî xistine bin bandora xwe. Bi alikariya herdu bîrayan, Friedrich û Wilhêlm Schlegel, Franz Bopp, Julius Klaproth û gelekên din. Yê ku di sala 1816-an de, cara pêşîn, ji noten Jones, yên li ser pevgîrîdana zimanen ïndoewrûpi, sistema lêkeren ve malbata ziman û xizmiya van zimanen ïndoewrûpi keşf kir, Bopp bû (25 sali). Friedrich Schlegel jî da ûsbat kirin, ku zimanen ibranî û yên erebî ne ji malbaten cuda ne. Di aliyekekî din de jî, ew planen qebûlkirî ku ibranî zimanen mirovayetiyê ye yekemîn e û rewadîtina bandoriya ve ramana tebâyî jî, rakirin; herwiha ew dîtinê ku ibranî xwediyê mîrasa çaykaniya hemû zimanen didîtin jî wenda bû. Ew ferqa di navbera "arîti" û "semîti" ye de şelû mabû mezintir dibû, heta bû sebebê çalakiyên bi "Arî" kirina ola xiristiyanîye. Bi riya ku Tewrad û Încîlê hanîn pêşberî hev! Ev jikarketineka "semîtizm" ye ya sistematik û ictadeka "aryanîzm" ye dinamik bû. Di vê maweyê de, ew guftûgoyen di derheqa ïndogermaniyan/arîyan de û koka wan ya ji Asyayê heta Ewrûpa, ango ji Hindîstanê heta Germaniya zelal bû. Di virde, mecalâ dîtinê din, ên li ser berbanga Ewrûpayê, bandoriya egeî-romiyan jî derket. Ev dîtin di jîngeheka wisan de dihatin bikarhanin, ku Fichte di axaftina xwe: "Axaftina ji bo Neteawayê Alman" de, 1808, ve idfayê pêşkêş dikir: "Gelê herûher dijî tenê em in. Em gelekî herî



lojîk. Ne tenê li çaxê navîn, herwiha li Asiyayê ji geriyan! Leibnitz "keşfa" ku zimanen almanî û zimanen ibranî nêziktirîn jîngehê ye û zimanen Hz. Adem e, kir. Ev yek, di sala 1823-an de, gavekî din jî bi pêş ve çû: J. Klaproth terma "ïndoewrûpi" ye bi sistematik bi pêş ve bir, wê bi terma malbata zimanen "ïndogermanî" ve guhast. Wî bi vê tewra nuh, di navbera zimanen almanî û yên hindî de gitêdaneka taybetî zelal dikir, ku hîn jî Alman di warê zanyariya ziman de vê termê bi kar dihînin. Ev bû rîçikeka dîrokî û ji aliye Tacitus ve dihate idealize kirin. Ev idealizekirina almanî hate parastin. Li gorî wî, ev dagîrkeren talanbir ku ji derva ve çandnenas û çandtelefker dihatin naskirin, yên ku pirensiyen Merovingi (Merovîngî), [Prensiyeka firankiyan, di navbera salen 400-751-î li Firansayê. S. K.] û Karolingi (Karolîngî), [Prensiyeka firankiyan di navbera 751-987-an de li Firansayê] damezirandine german bûne. Ew barbaren qehreman, yên ji yezdanen bê paxav, bi mîrxasi, Ewrûpayê bi dewlemendiya raman, di çaxê navîn de dane ji-yandin û li hember egeyîyan balansekê afirandine.

**D**i aliyekekî de jî, bi saya le-kolinê realist, gav bi gav nirxkirin rola sanskrîti û kevniya wî derdiket. Fersenda guhertina guftûgoyen di derheqa ïndogermaniyan/arîyan de û koka wan ya ji Asyayê heta Ewrûpa, ango ji Hindîstanê heta Germaniya zelal bû. Di virde, mecalâ dîtinê din, ên li ser berbanga Ewrûpayê, bandoriya egeî-romiyan jî derket. Ev dîtin di jîngeheka wisan de dihatin bikarhanin, ku Fichte di axaftina xwe: "Axaftina ji bo Neteawayê Alman" de, 1808, ve idfayê pêşkêş dikir: "Gelê herûher dijî tenê em in. Em gelekî herî

kevnare ne. Gelê pêşîn, gelê esilzade, yên Yezdan in !". Lê yê ku di sala 1853-yan de gavê duymîn avît, yekî firansî bû. Joseph Arthur de Gobineau bi awayekî fireh, bi xebata xwe "Essai sur l'inégalité des races humaines" biryara "arîti" ye ya dawîn da.

Ji sala 1700-î ve dîrokna, sîyasetvan, biyolog û gelek pisporê ku maneya van terman bala wan kişandibû, cudayetiyen di navbera gelan de mereq dikirin. Wan li ser van terman pirr guftûgo kirin, seren xwe pê êşandin. Digel tiştîn eškere wek, rengê spî, yên zer an jî yên reş. Di vî warî de, têgihîstînê eškere û zelal ku bingeha van cudayetiyen di navbera nijad, ziman û ji hev cihêkirina dîrokî wek German, Kelt, Romayî, Yahudî û hwd hebûn. Rewşa karekter ya fizikî û dirêjahiya, rengê por, rengê çavan û yên din li ber çav bûn. Ev karekter û cudayetiyen han dikaribûn bihatana pîvan û eškere kirin. Tiştî ku bi taybetî girîng bû formê qoq bû, ku diviya cureyê mejîyê mirov û karekterê kesî eškere bikira. Di vî warî de Anders Retzius [swêdî] bi cudakirina di navbera grupen keloxdirêj û yên keloxkin de, roleka mezin leyîst. Bonimûne: cudayetiyen di navbera swêdiyên keloxdirêj û finiyen keloxkin de bû. Yên pêşîn weka gelê cih, yên kevnare û yên dawîn jî weka biyaniyên ïndoewrûpi, ji Asyayê dihatin qebûl kirin. Li ser girêdana di navbera formê fizikî û serûsinç de dihat sekinandin û karekteren biyolojîk mîna zîrekî/şarezayî, bizav, delalî/başî hwd bûn. Ev şirovekirinê dîrokî nêzî dawîya xwe bûbûn. Hêviya serkeftin, pêşveçûn û afirandina berheman derketibû. Di cudakirinê nijadan de, serkevtin, bandordanîn, biyolojîk û karekteren nijadan ku berê hatibûn tesbit kirin, bi pêshukmî bûbûn xwediyê qedereka dîrokî.

**G**obineau aristokratekî ji çandê bêhêvî ye. Lê li gorî wî, dîrok hêdî hêdî bi paş ve diçe û fersenda felata ji roxandinê tune. Ew, termen nijadî mîna yekemîn sebebê vê yekê dibîne. Li gorî ditîna wî, sebebê vê têkçûnê dihevgerîna nijadan e. Ew dibêje, ev xwîna paqî i spî ya nijada temîz, "Arî" ku ji welatê xwe yên behiş derketiye, li cîhanê belav bûye û tevî xwîna gemarı ya zer û reş bûye, têk diçin. Dîsan li gor wî, "Arî" yên herî dawîn nijada Germen e ku xwediyê hêza jiyanê û kiryarân e. Bi awayekî xurt, ew di şirovekirinê xwe de antisemîtiyê dike. Li gorî wî, "ev Semîten rengzencî enfeksiyonê berdane nav hemû gelên rasta Egeyê. Wan bi zencîtiya xwe qedir û rûmeta nijadîn din daxistine jêr". Nav û dengê "arîti" ye bi vi awayî belav bûbûn. Paşê, "bavê" teoriya nijadî Houston Stewart Chamberlain [Îngiliz], vê teoriyê bi pêş ve bir. Klasikên wî yên nijadperestiyê, antisemîtizmê û pangermanîzmê, "Die Grundlagen des 19. Jahrhunderts" di sala 1899-an de derket û rengekî reş avîte ser Sedsala Bîstan.

Bi tevî dîtinê Gobineau, Chamberlain û hemû hemramanen wan, terma "Arî" ji nuh ve gihaştiye cîhekî din. Ew cengaveren kevnare yên bêtirs, keşeyen avestayî, qiralen faris dê bi vê maneya di dema me de, xwe nas nekin.

Ev çeteyê nefretê, yên ku xwe wenda kirine û bi cahilî bi pêş ve diçin, nizanin heke li Swêdê, "Arî" hebin; İrani ne, Zigenare (qereçî) ne, Hindî û Kurdên me ne !

Werger ji swêdî:  
Şefik Kaya

# Sêhra Nobêl

Mustafa Aydogan

Mirovok 56 salı û porrıspı beriya nuha bi çendakî centeyê xwe yê rêuwîtiyê avêtibû piştä xwe û bi jina xwe re berê xwe dabû dinyaya giravan. Ne numareyeke telefonê, ne ji tu navnışan li dû xwe hiştibû. Ji xwe, wê gavê tu kesi ji meraqeke weha nekiribû; ne bi keça wî Catherine, ne ji bi kurê wî Charles re meraqeke weha peyde bûbû. Hetta gava resepsiyonista otêla Maiotisê ya li bajarê Spartayê ji bo wî, jina wî Marie û malbateke din a ku hevaltiya wan dikir, li otêle cih veqetandibû ji mîna her muşteriyî bi wan re dabû û stendibûn. Ji bo pêywendîyeke taybeti tu pêwîstî nehatibû dîtin.

Çar pirtükên wî yênu ku bi wergera Roy Isaksson ve pêskêşî xwendevanê Swêdê bûbûn, bêî ku haya wan ji prosesa wergerandina bérhema pêncan hebe û bêî ku bizanbin wergera ya pêncan dê ançax di sala 1996 an de biqedede, di refikên dikanên pirtükfiroşan de, bêî ku baleke ewqas mezin bikişine, bi aramî rêz-kirî mabûn. Pirtükxaneyêna bajarêna cuda yê Swêdê û nemaze yêna bajarê Stockholmê heta wê saetê, ji bo deynkirina pirtükên wî bi daxwazeke weha xurt rû be rû nebûbûn.

Gava ji Dublinê hereket kiribû û ber bi dinyaya giravan ve firi-yabû ji tu kesi eleqadariyeke weha zêde nîşanî wî nedabû. Çûna wî, mîna bûyerekê nehatibû dîtin; ne di nava rûpelên tu rojnameyan de hatibû dîtin û ne ji ji tu radyoyn hatibû bîhîstîn.

Lê veger... vegera wî... Gelo ji bo ci vegera wî ji nişka ve bûbû bûyerekê ku ne ci sînorênl İrlan-dayê de ne ji di yê hemû Ewrû-payê de hildihat? Gelo çima ev veger bi derbekê bûbû cihâni? Akademiya Swêdê, malbata wî û rojname, radyo û televizyonen dinyayê seferber bûbûn. Hetta polis ji ji bo tesbitkirina cihê wî, bi hemû, imkanen xwe dixebeitî.

Çi bû wê rojê bû. Çi qewimî wê saetê qewimî. Roj roja pêncemê bû, tarix 5'ê meha 10'an bû. Mîlen saetê yeka paşnîviro nîşan didan. Ewrekî mahdtîş xwe berdabû ser bajarê Stockholmê. Çilapekêna baranê tev li bayê ku temberikên şekirî tev li hevdû dikir, wek nîşana amadekirina êrişikeke dijwar dihat nirxandin. Lê gava Sture Allén derî hêdî hê-

dî vekir û derket pêsiya civata ku bi heyecan û meraqeke mezin diliviya, ewrê ku xweskahiya Stockholmê di bin siya xwe de hiştibû, ji bo êrisa ku dihat fikirrandin, cesareta xwe bi derbekê wenda kir û mîna ku bibêje, "bibuhurin" bi edayeke poşman çilapekêna-xwe ji paş de vegerand.

Çi bû gava Sture Allén dest bi ilankirina biryara Akademiya Swêdê kir, bû. Sipîkêren radyoyan negîhaştin tiştekî bibêjin. Guh ji bo gotinên Sture Allén bel bûbûn û herkesi bi heyecan û meraqeke mezin guh dan radyoyan. Ci bû wê gavê bû. Li ba pirtükfiroşan pirtükên navê Seamus Heaney li ser bûn, aramiya xwe dan alî û refen vala li dû xwe hiştin û di navbera Heaney û mirovên ku bi heyecaneke mezin difûriyan de pireke edebî û mirovî ava kîrin. Yênu ku ew li ba pirtükfiroşan peyde nekirin, berê xwe dan pirtükxaneyan. Çapxaneyan ji bo jinûveçapkiran pirtükên wî desten xwe vemaltibûn. Wergêren gellek zimanen dinya-yê, ji bo wergerandinê pirtükên wî, li ser daxwazên berpirsiyaren weşanxaneyan bi kîf difikirin. Wê gavê dinya pê hesiyabû ku mirovok bi navê Seamus Heaney çûbû gerrê. Wê gavê keça wî Catherine û endamên din ên malbatê ji ber ku tu deng ji bavê wan tunebû, dest bi taswasekê kiribûn.

## "Helbestvanek bi carekê ket rojeva dinyayê"

Gotinên bi sêhreke mezin ku ji nişka ve hertişî biguherîne û kilîta deriyê cîhanek fireh û îmkanê qebûlkirin û nasandineke bêhem-pa ci bûn? Sture Allén ci got ku jiyana Heaney a sade û gerra wî ya bi awakî aram dom dikir, êdi nema dikaribû bi awaye ku hatibû plankirin bîmeşî? Akademiya Swêdê "Xelata Nobêl a Edebiyatê, ji ber niviskariyeke ku ji xweskahiya lîrîk û kûrahiya sincî (exlaqî) pêk hatîye û harîqeyen rojane û derbasbûna jîndar derdixîne ortê, dide helbestvanê İrlanđi Seamus Heaney". Gava Allén peyva xwe ya adeti qedand, helbestvanek bi carekê ket rojeva dinyayê. Êdi yênu ku ew nas nedikirin, ji bo telafikirina kêmasiyên xwe, dest bi cîvandina agahdariyên di derheqa vî helbestvanî de kîrin. Rójnameya ku beriya herkesi xwe bigîhandayê, dê ji yênu din bêtir bîhata firotin. Televizyonna ku program li ser cêbikira, wê ji yênu din bêtir bîhata temaşekirin.


Di dîroka İrlan-dayê de beriya wî di 1923'an de William Butler Yeats û di sala 1969'an de ji Samuell Becket Xelata Nobêl a Edebiyatê wergirtine. Seamus Heaney bi xelata îsal, navê İrlan-dayê dîsa derxist pêş û hîsîn İrlan-diyan careke din derxist bandevê.

Lê gelo Seamus Heaneyê ku cîhan li dû digeriya li ku bû? Vî mirovê ku ji iro û pê ve ne navdar bi tenê bû, bi xelata xwe ya ku bi qasî 7,2 milyon Kronen Swêdî di kir, herweha de wlemenc bû ji, gelo wiçawa bi mil-yonebûna xwebihata hesandin? Ger ew bi xwe ji bo ku li halê mala xwe bipirse, bi tesadufi li kurê xwe negerîya, belki heta gerra wî biqediya ji ew ê bi vê bûyera ku dê tesireke mezin li ser pêşeroja wî-hem wek mirov û hem ji wek niviskarbikira, nehisiya. Roja İniyê Heaneyê ku haya wî ji tiştekî tunebû, ahîzeya telefona otêla Karalis Beac'hê ya li bajarê Pylosê bilind dike û numaraya malê dîzîvirîne. Gava kurê wî yê ku bersiva telefônê dide, denge bavê xwe dibihise, bi lez û bi heyecan dest bi pîrsedike;

- Merhaba.  
Ma te bihîstiye?

- Na.  
- Xelata Nobêl dane te.

Bersiva mirovê ku ji ber kîf û heyecana bêsimor, nema dizanibû bê wê ci bigota, bi tenê "Na? Na? Na?" bû. Dibe ku bîhistina vê nûçeyê, ji bo dilekî 56 salı pîr-giran bîhata, lê dilê Seamus Heaney li hember vê şoka ku bi bîhistina nûçeyê re peyde bûbû, bi hesasiyeta helbestvanek xwe parazitî. Bi danîna ahîzeyê re, danûstendirîn li otêle ji binî de hatibûn guhertin. Hemû qedir û qiyemetîn ku heta wê gavê hatibû texsîkirin, bi derengî ba ji pişti bîhistina nûçeyâ ku di cîhana edebiyatê de olan dabû, bi comerdîyeke mîvanperwer ji nû ve derketibûn ortê û reng dabûn danûstendirîn roja İniyê. Personâlen otêle pişti pê hesiyabûn ku bê



Seamus Heaney

Foto: Marja Vazquez Diaz

derkevîm."

Piştî ku Heaney xwe ji desten muxabîren radyo û televizyonan ên ku li balafirgeha Kalamayê ci-viyabûn, xelas dike, ji bo çûyîna Dublinê, vê carê bi helikopterê tê Atînayê. Gava li Dublinê li balafirê dadikeve, ma li balafirgehê kî hebû kî tunebû... Lê serokwezîre İrlan-dayê John Bruton li balafirgehê, ew bi destê tu kesi ve berneda û dû re herduyan bi hevdû re berê xwe dan qesra serokkomar Mary Robinson.

Heaneyê ku ji balafirgeha Dublinê wek mirovok sade berê xwe dabû dinyaya giravan, ji gerra xwe ya nîvcomayî mîna qehremanekî vegeeria Dublinê. Hey sêhra xelatê, te ev hêza ku dinya bi carekê kir keskûsor, ji ku ve anîye? ...

# Xelata Nobêl a Edebiyatê 1901-1995

## 1901-1939

- 1901 Sully Prudhomme - Fransa  
 1902 Theodor Momson - Almanyâ  
 1903 Bjornstjerne Bjornson - Norveç  
 1904 Frederi Mistral - Fransa  
     José Echegaray - Spanya  
 1905 Henryk Sienkiewicz - Polonya  
 1906 Giosué Carducci - İtalya  
 1907 Rudyard Kipling - Ingiltere  
 1908 Rudolf Eucken - Almanyâ  
 1909 Selma Lagerlöf - Swêd  
 1910 Paul Heyse - Almanyâ  
 1911 Maurice Maeterlinck - Belçika  
 1912 Gerhart Hauptmann - Almanyâ  
 1913 Rabindranath Tagore - Hindistan  
 1914 Xelat nehat belavkirin  
 1916 Romain Rolland - Fransa  
 (Xelata sala 1915-an e)  
     Verner von Heidenstam - Swêd  
 1917 Henrik Pontoppidan - Danimarka  
     Karl Gjellerup - Danimarka  
 1918 Xelat nehat belavkirin  
 1920 Carl Spitteler - Swîsre  
 (Xelata sala 1919-an e)  
     Knut Hamsun - Norveç  
 1921 Anatole France - Fransa  
 1922 Jacinto Benavente - Spanya  
 1923 William Butler Yeats - İrlanda  
 1924 Wladyslaw Reymont - Polonya  
 1926 George Bernard Shaw - Ingiltere (Xelata sala 1925-an e)  
 1927 Grazia Deledda - İtalya (Xelata sala 1926-an e)  
 1928 Henri Bergson - Fransa (Xelata sala 1927-an e)  
     Sigrid Undset - Norveç  
 1929 Thomas Mann - Almanyâ  
 1930 Sinclair Lewis - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1931 Erik Axel Karlfeldt - Swêd

## 1932-1939

- 1932 John Galsworthy - Ingiltere  
 1933 Ivan Bunin - Sovyet (Fransa)  
 1934 Luigi Pirandello - İtalya  
 1935 Xelat nehat belavkirin  
 1936 Eugene O'Neill - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1937 Roger Martin Du Gard - Fransa  
 1938 Pearl Buck - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1939 Frans Eemil Sillanpää - Finlandiya

## 1940-1970

- 1940 Xelat nehat belavkirin  
 1941 Xelat nehat belavkirin  
 1942 Xelat nehat belavkirin  
 1943 Xelat nehat belavkirin  
 1944 Johannes V. Jensen - Danimarka  
 1945 Gabriela Mistral - Şili  
 1946 Hermann Hesse - Swîsre  
 1947 André Gide - Fransa  
 1948 Thomas Stearns Eliot - Ingiltere  
 1950 William Faulkner - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (Xelata sala 1949-an e)  
     Bertrand Russell - Ingiltere  
 1951 Pär Lagerkvist - Swêd  
 1952 François Mauriac - Fransa  
 1953 Winston Churchill - Ingiltere  
 1954 Ernest Hemingway - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1955 Halldór Kiljan Laxness - İzlanda  
 1956 Juan Ramón Jiménez - DYA/Puerto Rico  
 1957 Albert Camus - Fransa/Cezayir  
 1958 Boris Pasternak - Sovyet  
 1959 Salvatore Quasimodo - İtalya  
 1960 Saint-John Perse - Fransa  
 1961 Ivo Andrić - Yugoslavya  
 1962 John Steinbeck - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1963 Giorgos Seferis - Yûnanîstan


## 1964 Jean-Paul Sartre - Fransa (Sartre xelat qebûl nekir)

- 1965 Michail Sjolochov - Sovyet  
 1966 Shmuel Yosef Agnon - İsrail  
     Nelly Sachs - Almanyâ (Swêd)  
 1967 Miguel Ángel Asturias - Guatamala  
 1968 Yasunari Kawabata - Japonya  
 1969 Samuell Becket - İrlanda  
 1970 Alexander Solsjenitsyn - Sovyet (Swîsre)


## 1971-1995

- 1971 Pablo Neruda - Şili  
 1972 Heinrich Böll - Almanyâ Rojava  
 1973 Patrick White - Awustralya  
 1974 Eyvind Johnson - Swêd  
     Harry Martinson - Swêd  
 1975 Eugenio Montale - İtalya  
 1976 Saul Bellow - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1977 Vicente Aleixandre - Spanya  
 1978 Isaac Bashevis Singer - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1979 Odysseus Elytis - Yûnanîstan  
 1980 Czeslaw Milosz - Polonya (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê)  
 1981 Elias Canetti - Ingiltere  
 1982 Gabriel Garcia Marquez - Kolombiya  
 1983 William Golding - Ingiltere  
 1984 Jaroslav Seifert - Çekoslovakya  
 1985 Claude Simon - Fransa  
 1986 Wole Soyinka - Nijerya  
 1987 Joseph Brodsky - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1988 Naguib Mahfouz - Misir  
 1989 Camilo José Cela - Spanya  
 1990 Octavio Paz - Meksika  
 1991 Nadine Gordimer - Afrika Başûr  
 1992 Derek Walcott - Trinidad Tobago  
 1993 Toni Morrison - Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê  
 1994 Kenzaburo Oe - Japonya  
 1995 Seamus Heaney - İrlanda


Amadekar:  
M. Aydogan



Alfred Nobel



Sully Prudhomme



Ernest Hemingway

# Festîvala Fîlmêndî Kurdî ya Duwemîn

**D**i navbera 3 û 15'ê Çileya Paşîn de li Hambûrgê Festîvala Fîlmêndî Kurdî ya Duyemîn çêbû. Festival ji aliye Komîteya Piştgiriya Kurdistanê, HEVKAR û Buroya biyaniyan hat organîzirin. Di festivalê de 7 film hat nîşandan û 4 panel û semîner hat dayin. Filmêndî ku di festivalê de hatiye nîşandan ev in:

**Tunel:** Kurdistan 1993, rejî û sanaryo: Mahdi Omed, Kamera: O. Khamidov. Muzîk: Parvîz Nazarow, P. Tursunow. Rol: Ludmila Potapova, Yori Migoi, Tatiana Akoinovskaia, 90 deqîqe, Kurdî û Ingilizî. Filmek abs-trak'e, li ser trajediya gelê Kurd him li Kurdistanê û him li Ewrûpa dîmena pêşkêş dike. Rêwiye k bêdeng: Hollanda 1993, rejî û sanaryo: İbrahim Salman, Kame-



Bîstek ji filmê Tunel

ra: Peter Brugman, Muzîk: Dals-had Saîd, Serbest Zozan, D. Abdulkadir Yousif, Walid Hadj, Prod: Rolf Orthel/DNU film, 92 deq. Kurdî û Ingilizî. Film li ser şerî bêdawî çewa jiyana gunditîyê hilwesandiye ye.

**Bavê min, karkirê mîvan:** Almanya 1995, Rejî: Yuksel

Yavuz, Sanaryo: Cristina Karrer û Dorothaea Keist, Muzîk: Othman Serkar, 73 deqîqe, VORFILM, Ev film li ser jinê Kurd û têkoşîna wan e.

**Jiyana me Swîs 1994, Rejî û Sa-**



Bîstek ji filmê Jiyana me

naryo: Cristina Karrer û Dorothaea Keist, Muzîk: Othman Serkar, 73 deqîqe, VORFILM, Ev film li ser jinê Kurd û têkoşîna wan e.

**Ka Otonomiya Kurdistanê li ku derê ye?**

Almanya/Kurdistan Iraçê 1991-95, du filmê dokumenter û fil-

mên dîa, Amadekar: Kamal Karim. Film li ser jiyana Kurdistanâ Başûr e, ji krîza Delavê heta îsal.

**Diyarbekir - Ez wek hukukna-sekî ji xwe nefret dikim:**

Almanya 1994, Rejî û sanaryo: Karaman Yavuz, Kamera: Martina Radwan û K. Yavuz, Birrîn: Kurt Stahn û K. Yavuz, Prod: Yuksel Yavuz, Muzîk: Nizamettin Arîç, 85 deqîqe, Kurdî û Tirkî. Ev film li ser serpêhatiya Avukat Ruşen Aslan û Nizamettin Arîç a piştî cunta eskerî ya 12 Îlonê li girtîgehê Diyarbekirê ye.

**Dawet:**

Almanya 1991, Rejî û Sanaryo: İsmet Elçi, Kamera: Martin Gressmann, Birrîn: Doreen Heinrich, Muzîk: Nizamettin Arîç, Rol: Oguz Tunç, Aslı Altan, Halil Ergun, Gulsen Tuncer, 91 deqîqe. Film li ser trajediya gîredana bi urf û edetan û dijayetiya di navbera kulturan e.

## Hey Azadî!

Navê te  
li ser defterê xwe yên dibistanê  
li ser rûnişteka xwe û li ser daran  
li ser qûmê û berfê,  
dinivîsînim.

li ser her rûpelekî hatibe xwendin  
li ser her rûpelekî sîpî  
kevir be yan xwîn be,  
kaxez be yan xweli be  
navê te dinivîsînim.

li ser wêneyên zêrkirî  
li ser çekêñ şervanan  
li ser tacâ qiralan  
navê te dinivîsînim.

li ser biyaban û daristanan  
li ser hêlinan û irzêlan,  
li ser dengvedana zaroktiya xwe  
navê te dinivîsînim.

li ser çelengiyêñ şevan  
û nanê sîpî yê rojan  
li ser demsalêñ destgirtî  
navê te dinivîsînim.

li ser pîneyên xwe yî lajîwerdî  
li ser golê hetaveke genî  
li ser deryaçeyê heyveke jîndar  
navê te dinivîsînim.

li ser sira bayê berbangê  
li ser deryayê, li ser keştiyan  
li ser çiyayê kawikî  
navê te dinivîsînim.

li ser kefa ewran  
li ser xwêdana bahozê  
li ser barana tîr û bê çej  
navê te dinivîsînim.

li ser formêñ çurisandî  
li ser zengîlêñ rengan  
li ser rastgoya fiziki  
navê te dinivîsînim.

li ser derbendan, hişyar dibe  
li ser rîçan, tar û mar dibe  
li ser meydanan, coş dibe  
navê te dinivîsînim.

li ser mîweya du felqe  
mîweya neynikê û ya odaya min  
li ser textê min layeke vala  
navê te dinivîsînim.

li ser segê xwe yê xure û dilovan  
li ser herdû guhê wî yên miç  
li ser bejna wî ya serseri  
navê te dinivîsînim.

li ser depreşa dergehê xwe  
li ser tiştên mîşinî  
li ser pêla agirê pîroz  
navê te dinivîsînim.

li ser her laşekî canfidâ  
li ser eniya hevalen xwe  
li ser her destekî dirêjkirî  
navê te dinivîsînim.

li ser pencereya têkperan  
li ser lîvîn narîn  
bilind, ji bêdengiyê bilindit  
navê te dinivîsînim.  
li ser neamedeyiyê û arezû nîn e  
li ser tenhatiya rût  
li ser pileyên mirina xwe  
navê te dinivîsînim.

li ser tendûristiya vegeryayî  
li ser metirsîya nemayî  
li ser hêviya bê bîranîn  
navê te dinivîsînim.

Bi hêza peyvekê  
jiyana xwe ji nû ve dest pê dikim  
ji bo naskirina te  
û bi navkirina te ji dayik bûme  
Ey Azadî!

## ■ Paul Elward



## Paul Elward

(1895-1952)

Helbestvanê Fransî yê navdar Paul Elward, di Sherê Cihanê Yekem de; wek piştgir û xebatkarê aşîtiyê, dest bi berxwedana xwe ya piralî dike. Vê xebatê bi şeweyekî nîvisandi û dahênan, di pirtûka xwe ya bi nîvî(helbest in bo aşîtiyê) de, bi gewde dike. Piştî rawestana seri; di sala 1920'an de, Paul Elward hîmdarên bizava wêjeyî ya Fransayê dinase û peywendiyan wî li gel Aragon û Priton û Tizara tên avakirin.

Di sala 1921'ê de, bi çend berhemên xwe, beşdarî çala-kîyên tevgera dadîzmê dibe. Ü bi dîwana xwe ya bi navê (mirin ji nemana mirinê) di sala 1924'an de, bo demek dirêjtir û berhemgartir, tevlî tevgera suryalîzmê dibe.

Paul Elward di sala 1929'an de, jina ku dê bibe jêderâ peyama wî (îlhama wî), Mariya Benz dinase û di bin bandora vê peywendiya giyanî û hisî de, çend berhemên dilsojan e, evînamêz û narîn wek ;"peytexta êşê", "Evîn û helbest" û "Jiyana di cih de" diafrîrine.

Di sala 1926'an de li tevlî rexistina Partiya Komunist dibe û di tevger û xebata li dijî faşîzmê de roleke serekî dileyize û bi hêzdarî piştgiriya komarxwazêñ Ispanayê dike.

Di vê qonaxa dawîn de, Paul Elward hêdî hêdî wek bizav û wek alîgirî ji tevgera suryalîzmê cihê dibe.

# Wêjeya Misirê ya Kevnare -2-

Togny Säve Söderberg

## Lawijên (İlahiyên) Misrî û Loriyên payebilind

Dema tu (Aton) di asûyên  
drojava de diçî ava

Hingê cihan mîna ku mirî be  
tarî dibe.

Ew di odayan de sergirtî razayîne.

Çavekî wan ê din nabîne.

Meriv pertalên wan ji bin se  
ren wan didize,

bê ku pê bihisin.

Şer hemû ji qulên xwe derdike  
vin,

Mar giş pêvedanê dikan,

Tarîti bandorî dike,

Erd bêpêjin dibe,

Dema aferinenede di asûyê de  
xwe rihet dike.

Ev lawija Eknaton (Echnaton) ku xwedanê rojê, Aton, wek yê herî mezin şanîdide, helbesta herî navdar e di nav şî'rîn Misra kevnare de û ji awayê xurtiya ziman û oldariyê ve ji gelek dişibîhe wan ilahiyên rewanbêjî yê mali-ka 104'an ji kitêba du'ayan a dêran. Di nav wan lawijên lîrî yê di formen duayan de carna meriv pêrgî bîrcuryeke civakî ji dibe. Ew dua ne tenê bi awayekî rast-lehatî (tesadufî) û yekcâri hatine, lê belkî wek destnivîsên bedew ên dibistanan derketine holê:

Amon! Lê bihise  
wek ku di salona dadiresan de  
bi tenê be,

mîna xizanekî ne dewlemend.  
Gava dadires min bi zîv û zîr  
bixapînin,

ji bo nivîskarê daggehê  
û bi kincan ji bo zehmetkêşen  
qanûnê,

hingê belkî Amon têkeve şeklê  
wezirê

ku azadî dide min rebenî.  
Belkî ew reben bi vê yekê ma  
fî xwe bigre

û yê belengaz zora yê xurt bi  
be.

Seretayen (prensib) bestekariya helbesta Misrê, kês (wezn), hev-rezî (paralel) û zincirên bibîrxistinê (association) eyñî mîna ne wanen ku meriv di nivîsên pîramîdan de dibîne, lêbelê helbest li ser hevdengî (kafîye) û risteyan (kitayen helbeste) hatine avakirin. Her rêzek ji çend hecayen se-reke pêk tênu her yek ji wan hecayen ji risteyeke hevrêz tîne holê. Xuyaye ku beşeke mezin ji wêjeya Misrê li gor van sereta û qâideyan hatine avakirin, lê digel vê ji dîsa gelek caran meriv neşê cuðahîyeke eseyî têxe navbera

pexşana Misrê û helbesta wan. Ji nav helbesten hefidandî giş mîna lawij (ilahî), lawik (stranen bi şewat), stranen pesnan ji bo qira-lê hingê,

destanen serkeftinê yên leşkerî, dilokên şahiyan û geleki din, bi taybetî lawikên evîniyê herî zahf tesîrî li meriv dikan û ew in ku carekê besta nîvîserê "Strana Payebilind" rakiriye.

Ez evîna te ya pêşî me  
EZ ji bo te fena Baxê kulilkân  
im

li wir ez çîçekan û giyayê bîhn-  
xweş diçinim 5

## Zanista Jîyanê û Lihev- gerandina Siyasî

"Bi zanîna xwe nepesine û ji  
bo ku tu zanayî ewqas xwe nebîne,  
bi kesê nezan ji, wek yê zana,  
bişewire. Çunkî tu hunermend  
dawîya hunerê xwe tev nabîne û  
ji xwe tu kes ji neşê bigihîje xila-  
seka hunerî. Peyveke bi hiş ji ke-  
virekî biha ku meriv wî li cem  
querwaşike (cariye, kenîze) ber  
destaran ji dibîne, çêtir e".

Ev ji henek şîreten nivîserê herî  
bi nav û deng ê wêjeya Misrê ya  
zaniyarî û hindekariyê, Ptahhotep  
in û di vî warî de, kevntirin  
mînak in ku li Misrê hatine par-  
astin. Ptahhotep rewşa xebata  
dema pîramîdan û kar û barê  
wan ku li gor wextê xwe sazbûne,  
bi awayekî vekirî daye nasin.  
Li gor şîreten wî yê perwerde-  
kariyê divê mirov nefspîçûk be  
û ji serok, mezin yan ji berpirsiyare  
xwe re zahf sernerm be:

"Xwe ji mezinê xwe re bitewîne,  
bi vê yekê dê her tişt ji te re  
bê mal û tu dê destmizeke rind  
bistînî." "Dema wî pirsa te kir  
xwe jê re nizm bike û heyânî des-  
tûr nede, neaxive, gava keniya tu  
ji bikene, wê pir pê kîfxwêş bi-  
be". Ew gelek şîretan li serkar û  
mezinan ji dike û dixe bîra wan  
ku ew bi hiş û bîrewer derkevin  
pêşberî alîkarîxwazan: "Ger ku  
tu pêşewayek bî divê tu bi sebir û  
xwedî aram bî, wextê ku tu li  
xwestekî bihisî, ta ku ew derdê  
xwe nebêje wî neqewirîne. Kesê  
ku bi derd û kul e dixwaze derdê  
dilê xwe birêje."

Ev zaniyariyên pîramîdi, li  
Misrê gelek qîmet dîtine û ew  
kalasîkvanen ku di serê besê de  
navê wan bihûrî nivîseren berhe-  
mîn wusa ne.

Mînakeke dawî ji zanista  
perwerdekarî ya navdar ji heyamî  
Fîrawnan, "Zanista Amene-  
mopes" e. Wî di ferhenga goti-  
nen pêşîyan beşa 22 û 23'yan de  
xwe pirr nêzî "Peyyên Zanayan"  
kiriye, bîvî yekê ji wî gelek bal

kişandiye ser xwe û nav deng  
daye.

"Xwedê kamil e, lê mirov ka-  
mil nine, meriv tiştekî dibêje, lê  
Xwedê tiştekî din dike."

"Tiştekî mebêje! Ez bêguneh  
im. Guneh di destê Yezdan de ye  
û li ber Xwedê tiştekî ne kamil e."

"Bi yê Kor mekene, yariyê xwe  
bi acûcan meke û yê felc neşîne!  
Henekê xwe bi wî kesê ku di  
destê xwedê de ye, meke! Mirov  
herî û ka ye Xwedê ji hostayê  
avakirinê ye." 6

Hinek ji wan berhemên zani-  
yarî ji evên jêrî ne:

1. Zanista Çetî (Cheti) ye ku di  
serî de wek pîşeya rexneyen ser-  
girtî derbas bû. Ew, şîreten Çetî  
ne ku 2000 sal berî Isa li kurê  
xwe Duauef kiriye. Di wir de wî  
pesnê pîşeya nivîseriyê daye û  
avêtiye wan pîşeyen din, wan  
kêm xistiye da ku helwesta şagir-  
tiyên nivîsevaniyê rake û wan lê  
sor bike.

2. Zanistiya Merîkare ye, li gor  
nivîs ew ji aliye şahêkî ve ku da-  
wiya temenê wî di kul û keseran  
de derbas bûye, hatiye nivîsin. (li  
dora 2000'ê berî Isa).

3. Kehanetên (mirwa) Nofertî  
ne ku di serî de qala wan hate ki-  
rin. Di wan de salixê viyana pa-  
dışahê xanedaniya çaremîn  
(2600 sal b. Isa) Snûfru tê dayîn.  
Nofertî di wan de bahsa tengahî,  
ezyet, şerî hundurîn, tevîhevî,  
dagirkirîya biyaniyan, hemberi-  
ya navbera fermandaran û berî-  
dagerandina Xweda û xweristê ji  
ji wan, dike.

Teksteke balkêş ji ji wan keha-  
netan lîriyên xweş in ku merivek  
di wan de bi riya mirnê dixwaze  
azad bibe.

Ez ê iro bi kê re biaxivim  
bêdadî, bandorî li dinyayê dike  
û tu dawîyeke bi xweşî xwuya-  
nake.

Mirin iro li pêşberî min e  
mîna ku yekî nexweş baş bibe  
fena yek ji zindanê derkeve.

Fermandariya navîn (nêzî  
2000-1880'ê b. Isa) ji gelek hê-  
lén xwe ve lê bi taybetî ji ji aliye  
ziman û edebiyatê ve ji Misriyan,  
re wek pêleke kalasîkî tê ditin.  
Digel ku vê dawîye de zimanê xe-  
berdanê de, guhartinê pîr mezin  
çêbûne ji lê ew zimanê wêye yê  
berê, heyânî demeke dirêj piştre  
ji xwe parasiye. Ev yek ji wêjeya  
siyasi, ya kahînî, û ji mesele û çi-  
rokên ku di fermanrewahiya na-  
vîn de derketine holê û em niha-  
dibînî ji tê zanîn. Di vî warî de  
wek nimûne meriv dikare mese-  
leya cotyarê zarşerîn ku bi niheqî

wî dibin daggehê û ji ber gotara  
wî ya xweş, dadires wî li wir di-  
hêle û serpêhatiya gemîvanê keş-  
tişikestî ku gemiya wî li giraveke  
deryaya sor nixro dibe û marek  
wî rizgardike û hikayeya ku di  
dema xanedaniya dozdemîn de li  
ser Sînuhe hatiye nivîsin, bide.

Herweha "çiroka herdu biray-  
an" û ya "mîrxanê sérkîrî" ji du  
meseleyen xweş î sivik in ku di  
dema fermandariya nû de bi  
awayekî hêsa hatine nivîsin.

Wêjeya Misrê ya parastî ji per-  
yodeke nêzî 2500 salî berî Isa ve  
ye. Digel ku beşeke hindik jê gi-  
hayê destê me ji lê dîsa ji ber hej-  
mara wan a pirr û ji ber hebûna  
cûreyen cuda tê de, xebateke  
kurt ji li ser demeke dûr û dirêj  
digire. Em bi tenê dişen hinek  
pesnê zimanê wan ê edebî û  
xweş bidin, çiku zanîna me ya zi-  
man û nuansen wî pir hindik e.

Lê dewlemendiya Fantaziyên wê  
[wêjeya Misrê], xurtiya pevgirê-  
danen tê de, wêneşaniya (zimanê  
wêneyan) resena (orjinaliya) mi-  
nandîyen (mecazên) tê de û tekû-

ziya wê hê ji me hismetkar dihê-  
le. 7

Yê ku ji Swêdî werge-  
randiye:

Emîn Narozi

(5) Togy Säve-Söderbergh,  
Litteraturens Världs Historia  
Forntiden, ji nav r. 110-  
114'yan hatiye kurt kirin.

(6) Togy Säve-Söderbergh,  
Litteraturens Världs Historia  
Forntiden, ji nav r. 114-  
122'yan hatiye kurt kirin.

(7) Togy Säve-Söderbergh,  
Litteraturens Världs Historia  
Forntiden, ji nav r. 123-128'an  
hatiye kurt kirin.



Di nav çirokên Misriyan ên kevnare de cîhekî heywanan (ra-wulan) ê girîng hebûye. Ev şanoyeke daggehê ye ku tê de mişk  
wek dadires (hakim) û celad ji di sûretê pisîkekê de ku li súcdar-  
xortikekî Nûbî [navê deverekê ye li Afrîqa] - dixe, tê pêşkêş ki-  
rin. Berkoliyeke ser kevirê kirêcê ji xanedaniya 19'yan ya nêzî  
1200 sal berî Isa. — Wêne ji Enstituya rojhilat ya Şikago (Chi-  
go) hatiye girtin.



Ev mînakek e ji Kitêba Mirinê digel wênekêşiyen mirov û xwe-  
danen ku ji dema Romayıyan ve maye.



## Bi Kirdênda çorşmedê Madenî ya sohbetê -3-

□ Haydar Diljen

### Hevalî

-Veyvi bi estoran a anê, winî nê?

-E, bi estoran a anê.

-Wexto ki veyvi anê, hevalî vanê?

-E, senî nêvanê?

-Wexto ki veyvi kê pêrdê ci ra vejenê anê ìnî ser, hevalî vanê. Wexto ki yenê ìnî ser, veyvi ser ra çitênda girdi akenê. Kişa zomay ra di cinî û kişa veyvi ra zî di cinî koşanê çiti tepêşenê û hevalî vanê.

-Ti şena çend hevalî vajê?

-Zaf min vîrî di nêmendê.

-Ti çend ki zana.

Vayo pak o cêr ra yenô

Neftay derdê ma leqneno

Hevala veyver ser erzeno

Şarê dinyay ma huweno.

Ci huwiyyena, ci bermêna?

Qowim şîrin o, terk nêkena

Way hevalê, şîrina malê.

Verê bandê heval kört o,

Dalpan te de şirte-şirt o

Heval meberm zoma xort o.

### Şewas

Lajdê xo rî vajî, şinê veyvi anê, yêmeg-mêmegê xo wenê, aşiqî şewas nanê ro. Şewas zonê ti?

-E.

-Sirayê ra zengînan, sirayê ra feqîran.

-Yanê zengînî, ya zî kerway sere di roşenê, dima feqîrî roşenê?

-Tabî tabî. Kerway, birayê lajekî, emê lajekî. Cenîyan ayrı, comêrdan ayrı. Cenî jê.ode di, çê di yan kêber di.

-Cenîyan rî zî şewas kenê?

-Cenîyan di şewas nêkenê. Niqara nanê ro, herkes erzeno ser. Kes keynera xo nêverdano aşiq şewas bikero. Herkes peranê xo keno hadre, benê erzenê niqara ser.

-Yanê cinî cayêdo ayri di benê, winî nê?

-E, banêndo gird, yaxutda teber ra meydandê gird di, pere benê erzenê ser. XO ra cenî ameyê sêrdê şewasî. Hêç kes kêfdê şewasî ra zere di vindeno! To di senî kêt kenê diha? Ondan sonra, diha ki comêrdan baş kerd, niqara anê ortedê cenîyan di nanê ro. Cenî diha utanmaxla qaçmaz gitmez ya. Herkes peranê xo erzeno ser.

Wexto ki şewas kenê, mesela Ercan sere di nişto ro (roniştö). Vanê "Ercanê sor ra şewas, dewranê axayê sor ra şewas! "Zimbêlanê ey virazenê, çimanê ey lewî kenê, xo ver teqle erzenê.

-Nê aşiqî Kird (Zaza, Dimili) yê, Kurmanc ê?

-Aşiqî Kurmanc ê. Wina kenê,

dima, ki Ercan verî sozleşmiş biyo se, feqîran meşermaynê se, herkes farz êt panj hezarî erzeno ser, herkes winî ravêra. Eger sozleşmiş nêbê, Ercan zafini dano, aha aşiq qudirmış beno. Ü ê jê vano "Ez xo ney ra ronî, nêbeno, wêyki zî dano, xo rê xerc bo, borc bo wêy dano. Esgîni, aşiqan kenê zengîn.

-Yanê herey?

-Ya, ya. Pêrê min vatê "Bêrê sozleşmiş bê, herkes hona bikerê".

-Yanê "persa xo jew kerê, pê ser o vêsi mekerê".

-E, "pê ser o vêsi mekerê, guna yo". Eger persê xo jê nêkerê, o zêrrê dano, o bîn qarşidê ey di zêrrê dano. Gûmey ma zaten fortacî yê.

-Gûmey, yanê dewa şima?

-E. Pêro danê, aşiqan rê henday perey yenê pê ser. A cêne şinê çeydê xo.

### Maya veyvi yena ci heti

-Çend rojan a tepeya veyvi şima kê pêrandê xo, yan zî pî û maya veyvi yenê veyvi heti?

-Verî maya çeyniki yena. Vîst roj tepeya maya çeyniki yena. Ziyafet kena hadre.

-Kilincey niyâna?

-Kilincey zaten ana. Kergi kerda sûri, yan quzî çewîrmış kerda, goreyê butça.

-Quzî, yanê kavir?

-E. Zereyê ci kenê pir, çewîrmış kenê. Yaxut dîkê-didi kenê sûr. Ondan sonra kilincan milêncan gîna yena çeynerda xo heti. Ondan sonra a ki amê, di rojî-hîrê rojî çeydê çeynerda xo di bî meymani şî, bahdeya ci 9-10 rojî tepeya, zoma û çeyner a şinê çedê marda xo. Yê ki vanê "şima çend rojî bimanê, şima çend rojî izin dayo veyveri?". Zoma şewê wija ra kewno, dima yeno. Piyê keyneki vano "şima çend rojî izin dayo ci?". Wêrê lajekî vanê "15 rojî". Piyê keyneki vano "ma 20 rojî day ci". Vano "willahî eynan 15 rojî waştî, weşdê min şî, min 20 rojî dê ci, wa xo rê vîndero, marda xo ïnan heti çend rojî".

-Yanê iżnê mendişî piyê lajekî dano?

E. Piyê lajekî dano. Ki pî çinê bo, maya lajekî dana. Neyse, ki iżnê xo bî temam, ê do şirê veyvi dima biyarê. Aşta piyê çeyniki, hal û wextê xo rind o se, jû mangeri fineno a ra dimi, xelata çeyniki dano.

-Ki hal û wextê ci rind nêbo?

-Ki rind nêbo, peron danê yan jû bizêki danê. Meheqaq dewarê donê ci. Ê ki zaf duşkun, feqîrî bê se, jê fistan ci rê gênê. Eger zengînî bê, jê-didi altûnî qulp kenê.

Dewamê ci esto.

## Ferhengekê Kirdkî-Pehlewki-Kurmanckî-X-

Malmisanij

Kurmanckî

### Kirdkî(Zazakî)

#### K

kilînca  
kirkinci  
kinar, kenar, ver, pol  
kir  
kisti, kişti, kuşti  
kiştene, kuştuş, mirêneyîş  
kiştiş, kuştiş  
kizîr  
kîn, kînat  
ko, kû, koh, kûh, kuwe, kof  
koca, kura, ka  
koni, kûni, kuweni  
kor, kûr, çimkor  
korey, kûrey  
koşe, kose, goşe  
koşkar  
koşke, kûşki  
koteri  
kotile, kotilme, komi, koye  
koyek, kûyek  
koyî, kûyî, kofî  
kuçe, kuça  
kulawi, kelawi  
Kurd  
Kurdkî  
kurrik, kirrêk, kurri, kirri  
kuşat, kuşatey, kay, henek  
kutene, kutîş, kûtayêne  
kuwari, kari

#### L

la  
lane, lani, quele, kunî  
leb (lebiyyîş)  
lejg, azi, az  
lejkerdox  
lerzayêne, lerziyyâş  
lew  
lewi, muçî, paç  
lincî  
listene, liştiş  
limin, lêmîn, leymin, qilêr  
lîminey, lêmîniye, qileriniye  
lojini, locine, lozin, lozene  
lûw, lû, luye

### Pehlewki

#### K

kulaçek  
kerçeng  
kenar, bar, pehlük; keran  
kîr, kîr  
kust, kustek, keş  
kuşten, mircênen, kuştar,  
kuşten, kuştar, kuşış  
gêzir  
kîn  
kof, çikat  
kû gyak, kû  
kopên  
kor, kûr, korçeşm  
kûrîh  
koşek  
kefşer  
kuşk, koşk  
kepoter (2)  
kût  
kofek  
kofi  
koy  
kulaf  
Kurtîk, Kurt  
Kurtîk  
kurrek  
katek  
koften  
kelük, keparek

#### L

rak  
lan  
lapek, lawek  
azg  
leşker  
lerzîten  
lep, lef  
karî lep  
gil, lecen  
lişten  
rîmen  
rîmenîh  
roçen, rozen, roçanek  
ropas, ropah

#### L

ben, ta  
qul, kun  
lava, lave; lavayî/lavahî  
aj, ajik  
leşker  
lerizîn, lerzîn  
lêv  
maç, paç  
herî, gil  
alastin  
qilêr, qirêj  
qilêrî, qirêjî  
rojin, rojing, lojin  
rovî, rîvî

### Reyanê xo...

kişa peran ra zî dewlemendî niyê. Nê pêro qandê HADEP'i dezawantaj ê. Ancî zî HADEP'i do xo ver bido.

Goreyê min, gerek heme Kurdê welatheskerdoxî û Tirkê demokratî reyanê xo bidê HADEP'i. Ne ki tenya reyanê xo bidê, gerek ze militan ci rê bixebeitîyê zî. Bi ci sebeba beno wa bibo, ê ki partiyandê dewleti di benê namzet, reyanê xo danê eyna û eyan rê xebitêne, wa rind bîzane ki eyan tercîhê xo dewleti heti kerdo. Biewniyê, heme şefê polîsan, waliyê Kurdistani û sawciyê faşisti ê yê partiyandê iqtidarî ra benê namzeti ki meclisi diha vêşî terorîze bikerê û meşti

hesab nêdê.

Ki kes Kurdêndo, yan zî Kurdênda bi şexsiyet bo; wazeno wa çep bo, wazeno wa raşt bo, gerek kes ze sembolê bi şexsiyeteyda xo reyanê xo nêdo partiyandê dewleti û eyan miyan di ca nêgîro. Helbet tayn namzetê HADEP'i şenê bi zerrîda tayina nêbê, helbet tayn meseleyê HADEP'i ê bînî zî est ê. Ancîna zî gerek ma hesabê nê meselan verdê bahdê weçinayışî û çosmedê HADEP'i di ca bigîrê.

Her reya ki HADEP'i bigîro, do hem dinya di û hem zî Tirkiya û Kurdistani di bibo sembolê şerftê Kurdan û demokratandê Tirkan. Ki şima wazenê şerfdê xo rê wahê bivijî yê, reyanê xo bidê HADEP'i û HADEP'i rê bigirweyê.

(1) Kelimeyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî

(2) Pehlewki di "kepoter" yena me'nâ "boranî".

## Reyanê xo bidê HADEP'i

Haydar Diljen

**E**wro kurdistan di sî, sî ser o nêmenda. 3000'an vêşêri dewî amey amey veşnayış û xilnayı. Bi milyonana Kurdî Kurdistan ra amey vetîş û ê yê sükandê Tirkiya di gecekondîyan di jiyanêda perişanê ravérnenê. Bi deshezarana Kurdî ê yê zîndanandê Tirkiya di xo ver danê. Ancî bi hezarana Kurdî bi bêbextey a amey kişîş yan zî amey vinîkerdi.

Nê pêro netîcîyê politikada dewleti û partiyandê ci yê ki wazena bi orte ra werzanayısa mesela Kurdan "hel kero." Di nê hîrê serrandê peyênâ di barbareya ki dewleti Kurdistan di kerdi û aya kena, DYP û CHP dîrek iqtidari di bî û MHP zî bi ozel tîm û komandoyandê xo ya piraktik di iqtidar di bî. Partiyê ki direk iqtidari di nêbî zî fîkrê eynan iqtidari di bî û yardımı na polîtika kerdê. Ki şima meclîs ra vetîş û wija ra berdişê parlamenteranê DEP'i biyare xo vîrî, bes o.

**K**urdî, lej û xoverdayenda xo ê qarşidê na barbarey di tenya mendî; yanê bê tayn partiyê Tirkan ê cepî û çend rewşenbîrandê Tirkan, kesî ra vengêndo gurr nêvijîya. Helbet na mesela di tayn şâşeyê tayn partiyandê Kurdan zî bî, labirê esas mesela tesîrdê Kermalîzmî di mendişê Tirkan bi.

Ewro di nê şertan di Tirkîye û Kurdistan di hazırlaya reyan a ya bena. Kişî ra dewleta ki bêşexsiyet kerdiş û vinîkerdişê Kurdan dayo xo ver û heme partiyê ci; kişa bîni ra zî Kurde welatheskerdoxî û Tirkê ki qarşidê politikada dewleti a vijînê ê yê kewnê weçinayeni.

Ewro gerek Kurdî, mabêndê partiyandê ki paştiya dewletta Tirkîye gînê û ê ki qarşidê nê sistemiya yê tercîhê xo bikerê. Kes ya kişa dewleta yo û ya zî kişa Kurdandê welatheskerdoxan û Tirkandê demokratana yo. Weçinayenda (reyandê) 24 dê mengda 12 û di asil mesela na ya.

Ewro ez zaf kîfweşa ki HADEP'i a ya dekewna weçinayeni û çosmedê xo di cepheyê viraşto û a ya wazena nê cephî hewna hera kero.

Wexto ki min no nuşteyê xo nuş, mabêndê BSP, DDP, HADEP û SİP di bi namedê "Emeg, Ajbiyayış û Azadey" a bloqê amebi ronayeni û xeylê rewşenbîranê Kurdan û Tirkan zî eşkera kerd bi ki ê do

paştiya nê cephî bigîrê. Hetta, parlamenteñan DEP'i Ahmet Turk, Sedat Yurttaş, Sirri Sakik û rewşenbîrandê Tirkan ra merdimê zey Haluk Gerger û Akin Birdalî zî xo ze namzete HADEP'i misna.

Di serda 1979'ı di, itifaqdê Devrimci Demokratian û TSIP'i dima, bi heme kema-yenda xo ya bo zî, na fina sıfteyêna ki Kurdê welatheskerdoxî û tayn Tirkê demokratî ê yê mesela reyan wina ciddî gînê û piya itifaq kenê.


Na gamêda ca dir a û gerek kes destek bikero û qandê serkwîşdê ci bixebitiyo.

Helbet no itifaq itifaqêndo teng o. Hem kişa idolojîdê partiyê ki kewtê'nê itifaqî miyan û hem zî kişa formulekerdişdê talebandê acilan a, teng o. Wexto ki kes beyanata nê itifaqî waneno, kes eşkere vîneno ki perspektifê eynan perspektifê zaf cepî yê û mese-la sinifey zaf kewta talebandê acilan ê şarandê ma ver. Winî aseno ki cepê Tirkîya hewna nîweşey da xo ya 20-30 ser-ran verî ra nîreyaşê.

**H**elbet, ê ki ewro sistemde Tirkîya ra zaf zirar vîne-nê karkerî, dewijê feqîrî, memûrî û emekdarî bînî yê. La-birê, ki kes goreyê şertandê ewroy biewniyo mesela ra, ê ki halnêkerdişdê meselada Kurdan ra zirar vînenê qat-qat neynan bolêrî yê. Hetta zengînê Tirkîya ê girdî zî ê yê nîraziyayişê xo ilan kenê. Qandê coy, hewna hera giro-tîşê nê cephî menfeetê mesela da Kurdan o. Hetta gerek kes kîberê cephî, ê ki wazenê wa no herbê Kurdistani vindero û mesela Kurdan bi ajeya hal bi-bo, hemini rê akerde verdo. Tirkîya da ewroy di, wina wi-nîyişê mesela biya xeta sî-nordê demokrataiyî biyayışî yan zî nîbiyayışî. Kurdî gerek dost û dişmenê xo yê zerî û teberî goreyê winyayışdê na mesela tespît bikerê.

Nê parantêzdê dergî dim a ma fina bîrê asil mesela da xo ser. Şerîte weçinayîşdê emserî, qandê Kurdan û demokratandê Tirkan zaf musâidî niyê. Bi milyonana Kurdan cadê xo ra bar kerdo û nameyê eynan lîstanandê sandiqandi çinî yê. Xeylê xortan xo qeyd nîkerd. Zimistanê Kurdistani zaf çetin o. Korucî, tîmî û komandoy, qandê ki partiyê sistemî vêşî rey bigîrê, do her babet teror bikerê. HADEP û namzete ci

Dewamê ci r.15



Pazara Dihokê (Foto Armanc)

## Kurdistanê Başûrî

# Bêîstiqrarey dewam kena

Problemê lejê Kurdan o xwi bi xwi ne bi pêkerdişê Dublînî û ne jî bi ê Tehranî ya çareser nêbi û halo bêîstiqrar zey xwi dewam keno. Zek yeno zanayış pêkerdişê siftî yê Dublînî dima xeylê ke-san texmîn kerde ki lejê kurdan xwi bi xwi do wextêndo kilm di

vindero û ê do pê bikerê. Labelê kombiyayena didin a Dublînî dima asa ki ina nêshawo pê bikerê. Kom'bîyayena Dublînî dima tehrandi jî kombiyayeni virazyay la-belê wijadi jî inan nêşa pê bikerê. Nofin rojo 12.11.1995 di mesûlê hukmatê Amerikay ê minti-

qada Xelîcî Robert Deutsch şî Kurdistanê Başûrî qandê ki kombiyayena Dublînî dewam bikero bi serokê PDK Mesûd Barzanî û ê YNK Celal Talebanî dî, labelê fina winî aseno ki vernîşiyayenê çinya.



Leyla

Zana

xelata

Saharov

girot

Sstrasburg-Parlamentera DEP a verêni Leyla Zana ki nîka hepisdi ra xelata Saharov girot. Parlamento Ewrûpay xelata Saharovî dano. Û na xelati serra 1989 ra nata yena dayeni.

Grûba sosyalîstan Leyla Zana ze namzet mûsnîbî. Zek yeno zanayış Leyla Zana qandê xelata aşîti ya Nobelî jî ze namzet amêbî mûsnayış û ay ser o xeylê munâqeşe amebi kerdene.